# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL: 1 HEJMAR: 23 | 23 AVRÊL 1995 | BUHA:40.000 TL(KDVD)





### PARLEMENTOYA KURDISTANÊ YA LI DERVEYÎ WELÊT JI BO XEBATÊN AMADEKIRINA NÎZAMNAMEYÊN HUNDIRÎN DEST BI CIVÎNAN KIR

# BER BI HIKÛMETBÛNÊ VE

● Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt, li dû xebata 4 rojan, di bin serokatiya Zübeyir Aydar de Konseya Kargeriyê (KK) ava kir. KK, ji 14 endaman pêk tê. Di vê pêvajoya xebata parlementoyê de gelek qerar, qanûn, bername û komîsyon hatin tesbîtkirin.

● Serokê Konseya Kargeriya Parlementoyê Zübeyir Aydar: "Li Tirkiyeyê hemû riyên demokratîk li kurdan hatine girtin. Ji ber vê yekê me parlamentoya xwe li derve ava kir. Kî dixwaze bi kurdan re têkeve têkiliyan, divê parlementoyê muxatab bigire." Rûpel 2



### Serokê Lîbyayê Muammer Qedafî:

## Mafê kurdan dewleteke serbixwe ye

● Serokê Lîbyayê Muamer Qedafî bi axaftineke xwe ya roja 18'ê avrêl eşkere kir ku dîsa zor li kurdan tê kirin û mafê wan heye ku dewleta xwe ava bikin. Li gorî BBC'yê Qedafî di TV'ya Lîbyayê de bi îngilizî der heqê êrîşa tirkan a li ber başûrê Kurdistanê axaftinek kir.

● Serokê Lîbyayê got:" Pêwist e ku Neteweyên Yekbûyî (NY) kurdan biparêze û alîkariya wan bike ji bo ku ew dewleteke serbixwe ava bikin. Ez dixwazim helwesta xwe diyar bikim ku mafê wan jî wekî neteweyên din heye ku li ser axa xwe dewleteke serbixwe ava bikin, lê îro li wan zilm û zor tê kirin.

● Her wiha Qedafî got: "Şerê ku kurd didin mirov nikare wekî terorîzmê bi nav bike. Ew şer wekî şerê hemû gelek din şerekî pîroz e." Qedafî gotina xwe wiha domand:" Ez bawer im wê gelê kurd jî bi ser bikeve. Kurd birayê me ne."

**Welatê Me/Berlîn**

## Banga Abdullah Öcalan ji hikûmeta alman re

Gavavêtinên wiha yên ku em ji hikûmeta alman dipên li gorî hewcedariyên mafên mirovan û demokrasiyê ne jî. Em li benda tewra we ne ku hûn gelê kurd yê ku di nav Rojhilata Navîn de xwediyê dîroka herî kevin e wekî gelên dinyayê ji her alî ve xwedî maf bibînin. Em ji bo partiya xwe tiştekî taybet naxwazin. Mafê neteweyekî divê çi be, em wê jî, ji takdîra gelê alman re dihêlin."

**Rûpel 10**

## 'Divê parlemento berê xwe hîn firehtir bike'

Li ser avakirina Parlementoya li Derve, bera, derdorên kurdan çi difikirin, bi çi çavî lê dinihêrin û bi çi awayî dinirxînin? Heta ji dest û derfetên me hat me xwest em ji her dorhêla kurdan pirs bikin, lêpirsîneke pêk bînin. Çi sazî, çi rêxistin, çi kovar û rojname, weşanxane; çi partî û çi jî kesên navdar. Hinan ji wan, ne bi awayekî rasterast be jî pirsên me nebersinvandin. Me jî qîma xwe bi van kes, sazî, partî û derdorên weşanan anî.

**Rûpel 8-9**

## Sembola eşq û azadiyê: Hêmin Mukriyanî

Hêmin, helbestvanê eşq û azadiyê ye, li nik wî eşq hemû tiştên ciwan û bedew li xwe digire (dîlwey cwanî le her çî da hebê xoşim dewê–dîlweya bedewiye di çi de hebe ez hez jê dikim). Li ba wî tiştên wan û bedew di vê jînê de pir in, yek ji ciwan jî azadî û serfiraziya mirov e, lê carinan wisa çêdibe ku rê li ber mirov tê girtin ku şîna xwe jî ji bo mirovahî azadî û wekheviyê jî rûkare bi lêv bike.

**Rûpel 12**

### PARLEMENTOYA KURDISTANÊ YA LI DERVEYÎ WELÊT JI BO XEBATÊN AMADEKIRINA NÎZAMNAMEYA HUNDIRÎN DEST BI CIVÎNAN KIR

# BER BI HIKÛMETA KURDISTANÊ VE

Li dû îlankirina Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat (PKD12'ê avrêlê li Laheyê), mebûsan di bin serokatiya Yaşar Kaya de xebata xwe ya 4 rojan qedandin. Di dawiya xebatê de Konseya Kargeriyê (KK) hate damezrandin. Konsey, ji 14 endaman pêk tê û serokatiya wê jî Zübeyir Aydar dike. Li gorî qanûna damezrandinê ya ku ji aliyê PKD'ê ve hatiye qebûlkirin. Tê gotin ku wê parlemento, ji bo Kongreya Neteweyî bibe gaveke yekemîn û li ser navê temsîlkirina gelê kurd, wê sazkirin û rastkirinên siyasî û hiqûqî pêk bîne. Lijneya Giştî ya PKD'ê, Bernameya Lijneyê ya ku ji 31 xalan pêk hatibû, bi tevahiya dengan qebûl kir.

Bernameya hundurîn a ku serokê KK'ê Zübeyir Aydar pêşkêşî parlementoyê kir, li dû munaqeşeyan hate qebûlkirin. Di bernameyê de qanûna bingehîn, a hemwelatîbûnê, ya leşkerî, qanûna medenî û der barê hinek mijarên din de qanûn hebûn. Di rûniştinên parlementoyê de hilbijartin hatin çêkirin. Ji bo alîkariya Serokê Dîwana Parlementoyê Ahmet Aktaş û Doktor Cabbar, ji bo rêveberiya îdarî Nîzamettin Toğuç û Hesen Dutar, ji bo endamtiya katiban jî Ali Saçık, Dilek Kurt, Mustafa Rohat û George Ario hatin hilbijartin.

**Nîzamnameya hundurîn**

PKD'ê, nîzamnameya hundirîn ku ji 35 xalan pêk hatibû jî, bi piraniya dengan qebûl kir. Pişt re dor hate hilbijartina Konseya Kargeriyê. 14 endamên KK'yê ji aliyê Zübeyir Aydar ve hatin pêşniyazkirin. Ev kes, yeko yeko bi dengan hatin hilbijartin. Li gorî vê hilbijartinê, Îsmet Şerîf Wanlî, Remzi Kartal, Maşallah Öztürk, Ali Yiğit, Ali Sapan, Aydın Gül, Petros Katalay, Abdurrahman Dürrê, Hêlîn Ateş, Cafer Koçgirili, Necdet Buldan, Rüstem Biroyî, Ali Akbaba û Felemez Başboğa hatin hilbijartin.

**PKD'ê, bernameya birêvebirinê qebûl kir**

Serokê KK'ê Zübeyir Aydar, Bernameya Birêvbirinê pêşkêşî Lijneya Giştî kir. Aydar, di vê pêşkêşkirinê de bi vî awayî xîtabî endaman kir: "Parlementoya me, pişta xwe daye tekoşîna rizgariya neteweyî, da ku ji bo gelê me çareserkirina problemên demokratîk bîne. Di qada navneteweyî de wî bike xwedî statuyekê û li ser navê welat, her cure karên navneteweyî saz bike û birêxe. Bi destûra ku Parlementoya me ya qedirbilind daye Konseya Kargeriyê, rewşa gelê xwe ya acîl didin berçav û ji bo çareserkirina pirsgirêkê vê bernameyê bi cidiyeteke mezin, wê bide meşandin."

Piştî xwendina bernameyê, axaftina pêşîn ji aliyê mebûs Xanê Alkan ve hate pêşkêşkirin. Alkan, di axaftina xwe de diyar kir ku di bernameyê de îtiraza wê ji sê aliyan ve heye. Li gorî wê, pirsgirêka jinan di bernameyê de baş cih negirtiye. Alkan vê dibêje: "Li welatê me pisgirêka jinan pir muhîm e û pirsgirêkeke giran e. Ez Konseya Kargeriyê dawet dikim ku girîngiya wê fêm bike û têbigihê. Tevgirêdan û pêşketina civakê, li cihekî bi azadiya jinê ve girêdayî ye." Îtiraza Alkan ya duyemin jî li ser xortan bû. Li gorî wê, divêt ji bo "neçûna leşkeriyê" ya xortan jî bangek hebûya. Alkan, îtiraza xwe ya sêyemîn jî bi vî awayî anî zimên: "Ez, daxwaza rabûna qedexeyan yên li ser zimanê kurdî rast nabînim, divê em daxwaza azadî û serxwebûnê bikin. Êdî ne zemanê xwestina tiştên biçûk e."

**"Divê em bibin endamê NY'yê"**

Piştî axaftina Alkan, mebûs Mehmet Ermîş hate kursiyê û got ku ew kesên bername amade kirine, ketine bin tesîra kesên ku îslamê wekî xetereyê rê didin. Li gorî gotina Ermîş, di bernameyê de cihekî pir ji nêrîna îslamê re nehatiye veqetandin. Ermîş, kêmcihdayina nêrîna îslamê ya di bernameyê de rexne kir.

Mebûs Ahmet Aktaş spasiya xwe ji konseya ku bername amade kiriye re kir û dest bi axaftina xwe kir. Aktaş, da zanîn ku xalên di bernameyê de cih digirin, pir ne vekirî ne û divêt bername di bin du navan de, wek têkiliyên derve û yên hundur, bihata veqetantin. Aktaş peyva xwe wiha domand: "Ji hêla din ve divê neyê gotin ku emê bi Neteweyên Yekbûyî (NY) û Rêxistina Ewlehî û Hevkariya Ewrupayê (REHE) re têkiliyan deynin. Divê bête gotin ku em armanca me ew e, em bibin endamê NY'yê û REHE'yê."

Nêzî 20 mebûs çi di lehê bernameyê de û çi jî di elehê wê de, peyivîn. Li ser van rexneyan, serokê Konseya Kargeriyê Zubeyir Aydar derket kursiyê û piştî spasiya ji mebûsan re, ev got: "Emê rexne û pêşniyazên hevalan bidin berçav. Hûn jî dikarin teklîfa qanûnan amade bikin û bidin serokatiyê. Bernameme, ji hêla ruh û naverokê xwe, bi nirxan ve giredayî ye. Em ji we alîkarî û destekê ji bo bernameyê dixwazin, da ku em karibin vê bernameyê bimeşînin, hewcedariya me bi dengên we heye." Piştî axaftina Aydar, Bernameya Konsaya Kargeriyê hate pêşkêşkirin û bi piraniya dengan hate qebûlkirin. Gava Serokê PKD'ê Yaşar Kaya, encama dengdayinê îlan kir, endamên parlementoyê li ser piyan ji bo vê encamê li çepikan xistin. Li dû vê îlankirinê, mebûsan dest bi munaqeşekirina Danezana Encamê kirin û bi qebûlkirina danezana encamê, xebata PKD'ê hate qedandin.

**Komisyonên Parlementoyê û navên wan**

Hiqûq û Dad

Serok: Şerafettin Kaya, Berdevk: Serhat Bucak, Sekreter: Zeycan Özden.

Karên Derve

Serok: Mahmut Kılınç, Berdevk: Pitrus Karatay, Sekreter: Necdet Buldan.

Çand, Huner û Hêvojkarî

Serok: M. Emin Pençewînî, Berdevk: Şemdîn Burukî, Sekreter: Latif Kalfilat

Maliye

Serok: Nizamettin Toğuç, Berdevk: Mamo Acar, Sekreter: Mehmet Taşkale

Cemaet û Hindikahî

Serok: Felemez Başboğa, Berdevk: M. Sait Dûndar, Sekreter: Derwîş Hasan

Enformasyon û Têkiliya Bi Gel re

Serok: Kemal Yücel, Berdevk: Kazim Timûrlenk, Sekreter: Güler Taş.

Jin û Ciwanî

Serok: Hêlîn Ateş, Berdevk: Mustafa Rohat, Sekreter: Mehmet Dewran

Wezîfeya kesên ku di qabîneyê de cih girtine jî, ev in:

Serok: Zubeyir Aydar, Wekîlê Serok: Remzî Kartal, Cemaet û Hindikayî: Pitrus Karadayi, Têkiliyên Derve: Ali Ababa, Enformasyon û Têkiliya Bi Gel re: Aydin Gül, Enformasyon û Têkiliyên Dadê: Î. Şerîf Wanlî, Jin û Ciwan: Hêlîn Ateş, Çand Huner û Hêvojkarî: Maşallah Öztürk û Maliye: Alî Yiğit.

**Muxatab Parlementoya Kurdistanê ye**

Li ser qedandina xebatên PKD'ê yên li Laheyê, berpirsiyarên parlementoyê li paytexta Belçîka Brukselê, Navenda Çapemeniyê ya Navneteweyî, civîneke çapemeniyê li dar xistin. Serokê PKD'ê Yaşar Kaya, Serokê Konseya Kargeriyê (KK) Zübeyir Aydar û endamên komîsyonan mebûs Remzî Kartal, Î. Şerîf Wanli û Pitrus Karatay beşdarî civînê bûn. Di civîna ku ji aliyê 30 rojnamevanî ve dihat seyrkirin de Yaşar Kaya axifî. Kaya di axaftina xwe de got ku ji roja PKD hatiye îlankirin (12'ê avrêlê) û bi şûn de, xebat 4 rojan domiyaye. Li dû axaftina Kaya, serokê KK'ê Zübeyir Aydar li ser bernameya parlementoyê agahî dan. Li gorî Aydar, ji ber ku li Tirkiyeyê hemû riyên demokratîk li kurdan hatine girtin, wan li derveyî welêt parlemento îlan kiriye. Li ser pirsa rojnamevanekî Aydar got: "Kî dixwaze bi kurdan re têkeve têkiliyan, divê parlementoyê muxatab bigire." Aydar bersiva pirsa, "wê navenda parlementoyê li ku be" jî wiha da: "Li her derê Ewrûpayê kurdan saziyên xwe dameziranandine û ji bo vê yekê em texmîn nakin ku problemek derkeve pêş me."

**Parlemento ji bo çareseriya siyasî amade ye**

Di danezana encama xebata PKD'ê de hate diyarkirin ku parlemento jî bo "çareseriya siyasî" amade ye. Di danezana encamê de ev xal hebûn.

– Gelên ku li welêt dijîn, ji bo çareserkirina probleman terefdarê çareseriya demokratîk in. Talebên meşrû, xebat û metodên demokratîk yên kurdan ji aliyê rêveberiyê ve, bi tedbîrên leşkerî hatine sekinandin, ji bo vê yekê jî gelê kurd xwe mecbûrî mudafeyê dîtiye.

– Xweîfadekirin, li nasnameya xwe xwedîderketin û daxwaz û bikaranîna mafên kultûrî yên gelên li welêt, hem ji bo gelê kurd û hem jî ji bo gelê tirk ne kêmasî ye, bîlakîs ji bo wan feydeyekê tîne.

PKD, di zanebûna van problem û gelşan de ye û ji bo çareseriya meseleyan, ji her rê û metoda çareseriya siyasî û demokratîk re amade ye û vê biryardariya xwe bi dinyayê dide zanîn.

**Welatê Me**
**Günay Aslan**



**Endamên parlementoya Kurdistanê di dema rûniştinekê de. Di rêza pêşî de (ji çepê ber bi rastê) Serokê parlementoyê Yaşar Kaya, Maşallah Öztürk, Aydın Gül û Necdet Buldan.**

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 21'an de peyva veşarî **'Newroz a me ye'** dîtine û pirtûka **"Bexçeyê Vîşne"** qezenc kirine:

Ahmet Aral
Agirî

**Mazlum Rojbiyan**
**Wan**

**Ayşe Duydu**
**İsvîçre**

A.Rahman Sarıgül
Enqere

**Ali Mehmet**
**İzmîr**

Halil Katar
Mêrdîn

**İlhan Zeyrek**
**Stenbol**

Dilan Koç
Amed

**Ronahî Rewşen**
**Melazgir/Mûş**

Çetin Can
Bursa

# Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî Tirkiye protesto kir

Li paytexta Amerîka Waşîngtonê, Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Annesty International) li ber balyozxaneya Tirkiyeyê protestoyek li dar xist. Di protestoyê de zêdeyî 70 rêxistinên kurd û amerîkî jî cih girtin. Protesto ji bo ku li Tirkiyeyê mafên mirovan tê perçiqandin û îşkence didome, hate kirin. Di protestoyê de, li ser navê Hiqûqzanên Navneteweyî Balyozê Berê yê Amerîkayê David Korn axaftinek kir. Korn di axaftina xwe de got: "Komara tirk mafên mirovan diperçiqîne û li ser kurdan siyasetan qirkirinê pêk tîne. Divê Tirkiyê dev ji van polîtîkayan berde û ji başûrê Kurdistanê jî vekişe."

Serokê Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî Meryam Elahî jî axivî û ew jî bi giranî li ser mijara perçiqandina mafên mirovan sekinî. Elahî, di axaftina xwe de ji komara tirk sekinandina doza endamên Komeleya Mafên Mirovan yên Amedê Abdullah Cager, Melike Alp, Nimetulah Gündüz, Mehmet Şakir xwest. Di dema protestoyê de rojnamevanên tirk bêkontrol diketin balyozxaneyê. Vê yekê bala rojnamevanên biyan kişand û ew ecêbmayî hiştin, wan ji hev dipirsîn: "Ev rojnamevan in an xebatkarên balyozxaneyê ne."

**Welatê me / Waşîngton**

# Di girtîgehên Yozgat û Nevşehîrê grev didomin

Di girtîgehan de cerd û pêkûtiyên rayedar û cendirmeyan nasekine. Li girtîgehên cur bi cur li dijî cerd û pêkûtiyên rayedaran berxwedanên girtiyan didomin.

Li girtîgeha Yozgatê, greva birçîbûne kete roja 23'yan û rewşa tenduristiya girtiyan her diçe dijwar dibe. Li ser vê yekê malbatên girtiyên Yozgatê roja 16'ê avrêlê li ber rojnameya Cumhuriyetê daxuyaniyek dan çapemeniyê û tewra rayedarên girtîgehê û wezîriya dadê protesto kirin. Li gorî malbatan; di girtîgehê de rayedar û cendirme her diçe pest û cerda xwe dijwartir dikin. mafên însanî tev hatine qedexekirin û zarokên wan ber bi mirinê ve diçin.

Beriya demekê li Girtîgeha Konyayê, girtiyan bi greveke 43'ê rojan mafên xwe yên mirovî standibûn. Lê, rayedaran dîsa dest bi xespa mafan kiriye û di girtîgehê de bêhizurî derketiye. Malbatan li ser vê yekê bi pêşniyaznameyeke muracatê Wezîriya Dadê kirin û ji wezîriyê çareseriya probleman xwestin. Malbatan gotin: "Em gava ji bo hevdîtina zarokên xwe diçin girtîgehê, rayedar tiştên ku (cil, xwarin) em ji zarokên xwe re dibin, nadin wan." Girtiyên girtîgeha Newşehîrê yên ji doza PKK'ê jî, ji bo protestoya qetlîamên ku li Kurdistanê dibin û cerd û pêkûtiyên li girtîgehan dest bi greva birçîbûnê kirin.


**Navenda Nûçeyan**

## Li girtîgeha Mûşê 80 birîndar

Di 13'ê avrêlê de li hepsa Mûşê girtiyan, li hemberî xespa îdareyê ya mafên wan sekinîn û bi sloganan ev tewr protesto kirin. Hêzên dewletê (leşker û gardiyan) bi êrîşekê xwestin vê protestoyê û tewra mehkûman bişkînin, girtin ser kawîşan. Di êrîşê de 80 girtiyên siyasî birîndar bûn, 3 girtiyan jî xwestin xwe bişewitînin. Navê 3 birîndarên xedar ev in: İsmail, Sinan û Adem. Hêzên dewletê ev birîndarên xedar, ranekirine nexweşxaneyê jî. Li gorî agahiyê, piştî vê bûyerê hêzên dewletê 100 girtî sewkî Diyarbekirê û 20 girtî jî sewkî Entabê kirine.

**Welatê Me / Wan**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (21)




## XAÇEPIRSA BIXELAT (23)





Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 23'an; pirtûka **"Gotinên Navdaran"** e. Ev pirtûk ji aliyê Firat Cewerî ve hatiye amadekirin û weşanxaneya NÛDEM'ê çap kiriye.
**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**




**"Gotinên Navdaran"**



# Iraqê biryara NY'ê red kir

Rêveberiya Sedam Huseyin biryara NY'ê red kir. 'Konseya Fermandariya Şoreşê' ya Iraqê biryara ku Neteweyên Yekbûyî (NY) der heqê Iraqê de girtibû, wekî îhlalkirina hukimdariya Iraqê ya neteweyî bi nav kir û lê vegerand. Neteweyên Yekbûyî roja 15'ê avrêlê destûra firotana nefta bi buhayê 2 milyar dolarî dabû Iraqê. Wî welatê ku piştî şerê kendavê ketibû bin ambargoya NY'ê ji ber hinek şertên ku lê hatibûn girêdan ev biryar wekî "çewt û bixetere" nirxand. Li gorî qerara NY'ê diviyabû Iraqê bi pereyên nefta ku wê biforita, di bin çavdêriya NY'ê de pêdiviyên însanî bikirîna. Li aliyê NY'ê dixwest ku dest deyne ser 130 milyon dolarî ji bo ku li projeyên însanî yên li başûrê Kurdistanê xerc bike.

Her çiqas ev gav wekî gava yekemîn a hildana ambargoyê ji aliyê hin kesan ve dihat nirxandin jî, rêveberiya Sedam li hêviya bigiştî rabûna ambargoyê bû û ev biryara nîvco ne bi dilê wê bû. Nûner ê Iraqê ku li NY'ê ji bo rabûna ambargoyê xebat dikir, ev biryarnameya wekî encama hewldanên Dewletên yekbûyî yên Amerîkayê bi nav kir. Dewleta tirk jî hêvî dikir ku ji firotina vê neftê gelek pereyan qezenc bike, lê bi tewra rêveberiya Iraqê ev hêviya wê jî di avê çû.

**Nûçeyên Derve**

## Dîrokvanê Îsraîlî Martin Van Creveld:

# 'Dewlet girîngiya xwe winda dike'

Dîrokvanê Îsraîlî Martin Van Creveld ku di warê şer de wekî pisporekî tê qibûlkirin û li ser vê mijarê aqelmendiya Fermandariya Giştê ya Artêşa Îsraîlê û CIA'yê dike got ku êdî qonaxa şerên dewletan derbas bûye. Wî wekî, mînakên şerê sedsala 21an, şerê li Bosnayê, Somaliyê, Angolayê û Kurdistanê da. Creveld da zanîn ku niha li ser rûyê erdê 30 heb şerên bi rengî didomin.

Dîrokvanê Îsraîlê da got ku dewlet hêdî hêdî serdestiya xwe winda dikin û hinek fonksiyonên wê dikein destê rexistinên navneteweyî wekî: Yekitiya Ewrûpa û NAFTA'yê.

Her wiha, hinek fonksiyonên dewletê jî civatên ji neteweyan biçûktir wekî; civat, komele, eşîr pêk tînin. Newsweka 17'ê avrêlê cih da hevpeyvîneke bi Creveld re. Martin Van Creveld wekî nûnerekî stratejîstên DYA û Îsraîlê, bi aweyekî bîr û baweriya wan dewletan tîne ziman


Creveld dibêje ku wê hin dewlet parçe bibin û wê gelek dewletên serbixwe an nîv serbixwe derkevin holê.

Dîrokzanê Îsraîlê rewşa Meksîkayê ji bo ewletiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pir bi xetere dibîne, ji ber ku ji sînorê wê bi DYA'yê re heye.

Martin Van Creveld li ser şer dîtinên cihêreng tîne zeman: "Ew îdia dike ku serdestiya dewletan ji holê radibe, êdî şerê mezin dernakevin. Crevel dibêje Bêyî organizasyonên burokratîk ango dewletan kes nikare felaketên ewqas mezin bîne holê, ji lewre şerê cîhanê yê sêyemîn dernakeve." Creveld, xwedikirina artêşên mezin û kirîna çekê giran ji bo dewletan bêker dibîne.

Li gorî îdiaya Creveld tehdîta çekên nuklîer wê ji rêxistinên çekdar bê. Ew dixwaze ku stratejîst dev ji polîsiyê berdin bi çavekî din li bûyeran binêrin.

**Nûçeyên Derve**



**Martin Van Creveld**

# Konferansa çekên nukleer dest pê kir

Konferansa Neteweyên Yekbûyî li ser bikaranîna çekên nukleer li bajarê Newyorkê dest pê kir. Di vê konferansa ku roja 17'ê avrêlê dest pê kir de dewletên ku xwediyê derfetên pêkanîna çekên nukleer in dixwazin ku temenê Peymana Ne–belavkirina Hêza Nukleer (NPT) heta hetayê direj bikin. Vê peymana ku di sala 1970'yî de hatibû îmzekirin 25 salên xwe tijî kiribû. Dewletên ku ji wê îmkanê bêpar in, bi taybetî jî welatên endamê Tevgera Bêbend ku serokê wan ê dorvegerî Endonezya ye, bi vê yekê razî nabin. Tê gotin ku nûnerên Amerîkayê bi mebesta pelişandina yekîtiya endamê vê hevpeymaniyê, şantaj û tehdît jî di nav de, her cure azîneyî diceribîne.

Ew ji bo ku bigihîje armanca xwe divê ji 177'an 89 reyan bistîne. Hejmara dewletên endamên Tevgera Bêbend 111 e. Li aliyê din Misir û hinek dewletên ereb ji ber ku Îsraîlê peyman îmze nekiriye, peymanê qebûl nakin. Dîsa Pakîstan ji bo ku peymanê îmze bike, şertê îmzekirina Hîndistanê derdixe pêş. Divê bê gotin ku Hindistan wekî çavdêr jî beşdarî konferansê nebûye ji ber ku ew dewletên mezin bi neheqiyê sûcdar dike. Tê zanîn ku du dijberên kevnare li ser çekên nukleer dixebitin û di vî warî de hinekî rê girtine.

Welatên ji cîhana sêyemîn didin zanîn ku dewletên serdest di warê bikaranîna hêza nukleer de jî neheqiyê dikin û berpirsiyariya xwe ya ku Peymana Ne–belavkirina Hêza Nukleerê li wan bar dike, naynin cih.

Welatên xizan dixwazin ku; bergiriyên bêçekkirinê bi lezgînî bên cih; bi awayekî resmî ceribandinên çekên nukleer bê qedexekirin; dawî li hilberiya hacetên çekên nukleer were; rê li ber wan dewletan vebe ku karibin xwe bi hêsanî bigihînin teknolojiya hêza nukleer, ji bo armancên sivîl. Li gorî çavkaniyên resmî, DYA'yê (1945–1992) zêdetirî hezar ceribandin, Rûsyayê (1949– 1990) 715, Îngilistanê (1952 –1991) 44, Çînê (1964 û 1994') 41 û Fransayê (1960–1991) 210 ceribandin pêk anîne. Endamên Greenpeace'ê di pêvajoya konferansê de li cihên cur bi cur avakirina reaktorên nukleer protesto kirin. Konferans wê çar hefteyan dewam bike.

**SAMÎ BERBANG**



**Ji rojnameya Al Hayat'ê – Nivîsa li ser tankê "Artêşa Tirk" hatiye nivîsandin.**

www.arsivakurd.org

# FAL

**BERAN (21 Adar – 20 Avrêl)**

Hûn tim ji sîxurên neyêr ditirsin. Ji we ku wan dev ji hemû karên xwe berdanê û ketine dû we. Carê bifikirin, êdî çiyê me maye ku em jê bitirsin, kerê mirî ji guran natirse. Xebata xwe bêtirs bikin, wê ji gund xebereke xweş ji we re bê.

**GA (21 Avrêl – 21 Gulan)**

Hûn bi ku ve biçin, dîsa li mal vedigerin. Êdî wisa maliyên we dibêjin: "Zivir zivir dîsa li vir." Ji ber vê yekê guh nadin daxwazên we. Divê hûn demekê dirêj ji mal dûrkevin. Jixwe riyeke dirêj li ber we heye. Bixêr be!

**CÊWÎ (22 Gulan – 21 Pûşper)**

Hûn tu girîngiyê nadin karê ku hûn dikin. Bi dîtina we ew bi kêrî tiştekî nayê û hevalan beredayî ev kar li we bar kirine, lê wê rojek bê hûnê ehemiyeta karê xwe fêm bikin. Divê hûn ji bîr nekin ku serê heft newalan newalek dibire.

**KEVJAL (22 Pûşper – 23 Tirmeh)**

Hûn divê ji bo karekî pêwist têkiliyên xwe yên bi mal re bibirin, lê destê we ji dê û bavê we nabe. Welat ji dê jî şîrîntir e. Dema welat bindest be, tu wateya evîna dê û bavan namîne. Wê îsal gur pir har bibin, divê hûn xwe jê biparêzin.

**ŞÊR (24 Tirmeh – 23 Gelawêj)**

Dema hûn dikevin tengasiyê, hûn tavilê dest diavêjin zimanê tirkî. Ew ji bo karê we ne tiştekî baş e. Hin caran hûn dixwazin zora hevalên xwe bibin, lê ji bîr nekin ku pola ji pola naxwe.

**SIMBIL (24 Gelawêj – 23 Rezber)**

Hûn dixwazin her kar bi dilê xweş hel bibe. Rewşa dinyayê û xêrnexwaz pirî caran rê nadin vê yekê. Wekî ku pêşiyên me gotine: "Zor gizêrê radike." Divê hûn car caran wê riyê jî biceribînin. Ji dostekî xwe re qevdek gulên kesk û zer û sor bişînin.

**MÊZÎN (24 Rezber – 23 Kewçêr)**

Gelo hûn ji bo çi tim gotinên tal dikin, xeberên nexweş digihînin dost û hevalan. Hin caran jî ji aliyê baş ve li bûyeran binêrin û dilê hevalên xwe geş bikin. Gotina xweş bihara dilan e ji bîr nekin.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr – 22 Sermawez)**

Hûn ji bo çi xwişk û birayên xwe yên li xeribiyê dihesûdin? Gelo haya we jê tune, pêşiyên me gotine: "Dûro bi nûro!" Hûn gava xwe navêjin derî malê û dixwazin ku malî qasî kesên li xeribyê bêriya we jî bikin. Lê ne mumkun e!

**KEVAN (23 Sermawez – 21 Berfanbar)**

Êdî mîrê mişkan bûye axayê gişkan. Kesên ku di warê dizîn û şêlandinê de jêhatî ne, dibin malmezin û beg. Hûn jî wekî nezanan ji wan re nebêjin: "Aferîn!" Qutiyek hebên "aferînê" ji xwe re bikirin, dibe ku wan rojan eşek bikeve serê we.

**KARIK (22 Berfanbar – 20 Rêbendan)**

Baweriya xwe bi gotinên dê û bavê xwe bînin, ew rast dibêjin. Mî pêl berxê xwe nakin, ew başiya we dixwazin. Herin ji wan lêborîna xwe bixwazin, dilê hevalên xwe jî nehêlin. Hinekî sporê bikin.

**DEWLIK (21 Rêbendan – 11 Reşemî)**

Bi gotinan hûn xweş dikin, lê kes ji we bawer nake. Divê hûn hînekî xebatê bikin da ku hûn karibin wan îkna bikin û kes nebejhe: "Xweş xebere, lê min ne bawer e." Darekê ji bo şehîdên azadiyê biçînin bila heta hetayî bijî.

**MASÎ (20 Reşemî – 20 Adar)**

Hûn evqas jî kar ditirsin ku ji we nayê hûn dest biavêjin karekî biçûk jî. Lê şixul wekî kerê ye, tu bajoyî diçe. Loma divê hûn hinekî zorê bidin xwe. Wisa bikin ku kar di dest we de bike qareqar ne hûn di dest kar de. Xwe ji maran biparêzin.

# Hûn heta nebêjin kevir



Rojekê gerîla (şervan) diçin gundekî û li vî gundi cerdevan û ajan jî hene. Ji ber vê yekê gerîla radibin diçin mala pîrekê û li vê derê nan û avê xwe dixwin û bi pîrê re dipeyivîn. Dema ku wextê rabûna gerîla tê û wê rabin, herin, di nava xwe û pîrê de îşaretekê (parola) datînin û navê îşareta wan jî "kevir" e. Piştî çûna gerîlayan mehek, dumeh derbas dibe û gerîla dîsa tên ber mala pîrê. Li derî dixin, Pîr dibêje: "Hûn kî ne?" Gerîla bersivê didin dibêjin: "Pîrê em in em.....em gerîlayên ku hatibûn mala tê ne." Pîr ji wan bawer nake û derî venake. Gerîla dîsan li derî dixin, pîrê aciz dibe dibêje: "De wele, hûn heta nebêjin 'kevir' min derî venekir."

FIRAT AGIR

# Şeytanê kurdan

Kefirelab gundekî Midyadê ye, tê de sêsed mal hene. Ji 95 mihelmî ne. Ew xwerû cerdevan in û roja 20 adara 1995'an, cerdevanê gund li ser coka avê ku diçe çolê bi nava hev ketin. 2 kes mirin, gelek jî birîndar bûn.

Mirovekî ji wî gundî ku li Mîdyadê rûdinê, bi navê xwe Hesenê Ereb, ji roja bûyerê ve ji mirovan direve. Ji lewre tinaz û henekên xwe bi hevalên xwe yên kurd dikirin. Hercar wiha digot:

"Hûn kurd li ser sîrekê karin hev û din bikujin, hûn mêr in lê rayek ji ya mêraniyê ehmeqî ye, kurdên Zaxaran ji ber ku zarokekî kevir avête seyê wan, heft kes ji hev kuştin. Bizineke yê Behwarî kete rezê yekî Halexî herdu gund dijminê hev in."

Piştî van peyvan dibû tiqe tiqa wî û têr dikeniya.

Êdî keysa hevalên wî yên kurd lê hatiye. Li qehweyekê girtin û lê hatine hev. Tinazê xwe pê kirin û wiha gotinê:

"De bibêje gundiyên te li ser çi li hev û din xistin"

Hesen nêrî ku lingê wî kirine sola teng, dîsa bi tinazê xwe kete peyvê û got:

"Heyran hûn doza çi li min dikin? Gundiyê min li ser rûyê we kurdan hevûdû kuştin."

Tevan biken gotin:

"Ev çima?"

Hesen peyva xwe domand û got:

"Ma ne çima? tirko gundên we vala kirin. Hûn hemû koçber kirin. Êdî şeytanê we kurdan xwe li gundê me girt. Lewre cih jê re nema. Dîsa Xwedê jê razî be ku dudo dane kuştin. Ku wekî yên we heft bûna kî zane wê bê çi..."

Yekî bersivand û got:

"Çi sûcê feqîrê şeytên heye? gundiyen te bi keleşan bi hev ketin ên me bi keviran bû, bi daran bû......"

Hesen keniya û got:

"Tu li aqilê xwe binêre. Hirç û govend, rovî û sûk, êdî cerdevan û keleş. Heta doh şilfikeke hesinî di berîka wan de nebû, niha tirko keleş bi milên wan ve daleqandine. Hemû mîna kerê biharê ku bitir dibe û zîtirkan davêje, bûne. De êdî ma Xwedê, Şeytên, wê cihê xwe dîtiye."

JÎR DILOVAN

# Dinyaya derewîn

Mirovek dinihêre ku melayê gundê wan heriyê (pişrûk) çê dike. Dihere cem wî, jê re dibêje: "Mele ew çi ye tu çêdikî?" Mele dibêje: "Ev herî ye, emê tenûrekê çêkin. Çi bikim tu tiştek ji vê dinyayê derewîn nayê."

Gundî lê dinêre ku teşî di destê melê de ye û dirêse. Dîsa jê dipirse: "Lê ew teşî çi ye?" Mele dibêje: "Min got hêj destê min vala ye, ezê hinekî teşiyê birêsim. Çi bikim tiştek ji dinayayê nayê."

Mirov pirsên xwe wiha didomîne. Lê ew çi meşk e, li pişta te ye?

Mele got: "Hey ez didim lotikan, bila belasebeb neçe, bila dewê me jî çêbibe. Ew jî dew e."

–Lê ew çi tizbî ye di destê te de ye?

Mele got: "Çi bikim tiştek ji dinê nayê. Min got ji bo axireta xwe ezê çend selewatan bikişînim. Ev tiliyên min vala mabûn."

Mirov şaş dimîne, jê re dibêje: "Mala te mîrat be, tu çar pênc karan bi hev re dikî, hîn jî tu dibêjî tiştek ji dinya derewîn nayê".

ÇIYA MAZÎ



# 'Jimmy Boyner' û BBC

Serokê Hereketa Demokrasiya Nû (YDH) Cem Boyner, li paytexta Îngilîstan, ondonê roja 12'ê avrêlê radyoya BBC re wê hevpevînek çêbikira. Lê ev hevpeyvîn çênebû. Rojnamegera BBC'yê ji Cem Boyner dipirse: "Hûn li ser hereketa (cudaxwazan) ku dom dike, çi difikirin?" Boyner vê pirsê qebûl nake û dibêje: "Em ji wan re nabêjin 'cudaxwaz', li gorî me ew 'terorîst' in. Ji bo vê yekê lazim e tu jî di pirsa xwe de vê peyva 'terorîst' bi kar bînî." Rojnameger jî li ser fikra xwe danayê û dîsa eynî pirsê dipirse. Ji lewra hevpeyvîn çênabe. Rojnameyên tirk jî ev tewra Boyner ecibandin.

Em dizanin sempatiya hin kurdan di rojên ewilî de li hemberî Boyner û hereketa wî hebû li ba hin kesan hîn jî bi awayekî dewam dike. Li ser bêşensiya kurdan ne hewce ye ku em bipeyivin. Li ser îxaneta siyasetvanên tirkan jî ji aliyê çapemeniyê ve ku mirov li meseleyê dinihêre, rewş û sewiyeya çapemeniya tirk û ya navneteweyî ji hev kifş dike. Lê tiştekî din jî kifş dike; gelo çi heqê Cem Boyner heye ku li gorî hesabên xwe yê siyasî û ne însanî, baweriyên rojnamegera Îngilîz biguherîne. Wekî herkes dizane, ew tewra te ne îstisna ye. BBC Wê hem di şerê Falklandê û hem jî li hemberî ÎRA'yê tu carî li gorî menfeetê siyaseta hikûmetên Îngilistanê hereket nekiriye. Bîr û baweriyê vê saziyê, li gorî şert û şurtên çapemeniya objektîf in, ne li gorî îhtiyac û daxwazên siyaseta dewletan in.

Cem Boyner, li Tirkiyeyê wekî hêviyekê tê dîtin. Lê gelo ew çiqasî layiqî vê hêviyê ye. Ez bawer dikim ne hewce ye şîroveya dor fireh. Bi tenê ez dixwazim bi mînakekê biqedînim. Nivîskar Çeîîn Altan di nivîseke xwe de digot: "Ez ditirsim ambalaja Cem Boyner li Amerîkayê hatibe çêkirin." Yanê bi gotina wî, Boyner, li ser demokratbûnê xwediyê dîtineke çêkirî ye. Çetin Altan, ji bo vê yekê jî navê wî diguherîne û dibêje: "Jimmy Boyner." Em jî dibêjin: "Jimmy Boyner li Tirkiyeyê pîroz be."

**SUUT KILIÇ**

## Hîmê rojnamegeriya kurd beriya 97 salan hate danîn

# Rojnameya 'Kurdistan'

22 avrêlê (nisan) 1898; ev mêjû, destpêka rojnamevanîtiya kurdî ye. Li barşûrê welêt, mîna roja rojnamevanîtiya kurdî tê pîrozkirin. Hema em bibêjin ku kurdan sed sal berê dest bi derxistina rojnameyekê bi kurdî kirine û tevî cîhana rojnamevanîtiyê bûne.

Gava em destpêka rojnamegeriya bi kurdî û ya bi tirkî bidine ber hev, emê rind bibînin ku demeke dirêj di navbera wan de nîn e. Ji lew re, rojnameya bi tirkî ya pêşîn "Takvim–i Vakayi" ye û bi fermanan Sultan Mehmûdê II. derketiye. Sal jî sermawez (mijdar) 1831 e. Rojnameya arizî (xusûsî) ku wisa ji aliyê dîrokzanên tirk ve tê pejirandin, Tercüman–ı Ahval e. Derhênerê wê Agah Efendî ye û di 21'ê kewçêra (cotmeh) 1860'î de derçûye.

Di daxuyaniyên jorê de diyar dibe ku li gorî tirkan, tevî ku pergala Osmanî di destê wan de bû; xwedî karîn, desthilat û raye bûn; kurd di vî warî de dereng nemane.

Îro kurd, bi çi kend û kospan, asteng û dijwariyan re rû bi rû dimînin, di dema Osmanî de jî wisa bûye. Kurdan li biyaniyê, bi hezaran kîlo metre dûrî welêt, rojname weşandine û gihandine mirovên xwe. De ka werin em bala xwe bidine kurte–çîroka derxistina rojnameya pêşîn a kurdan:

Cara pêşîn di 22'yê avrêla 1898'an de li Misirê, bajarê Qahîrê derketiye. Derhênerê wê Mîqdat Mîthed Bedîrxan e û kurê Mîr Bedîrxanê Botî ye. Rojname ji tehdeyên Sultan Abdulhemîd ku li malbata Berdîrxaniyan dike, Mîqdat Midhed Bedîrxan piştî hejmara 5'an derdixe, difetile paytexta Osmanî Stenbolê.


سالا اول
کردستان
۱۳۱۰
KURDISTAN
Adresse : Rue de Carouge, n° 7, GENÈVE (Suisse)

Berga Rojnameya Kurdistan

Rojname koçî Cenewreya Siwisreyê (Îsviçereyê) dike. Dîsan ji malbata Bedirxaniyan, Ebdirehman Bedîrxan dest diavêje derxistina rojnameyê û hejmara 6'an li Cenewreyê çap dikin.

Piştî hejmara 20'an, rojnemeyê careke din bar kiriye û çûye Londona Îngilistanê. Li wir jî hejmarek derketiye; di pey de berê xwe daye jêra vî welatî Falksandê. Li vî bajarê biçûk jî du hejmar çap dikin û car din vedigerine Siwisreyê. Heta rawesîtna weşandina rojnameyê, li wê dimînin. Hejmara dawîn di 14'ê arvêla 1902'an de diweşe.

Kurdistan tevîhev 31 hejmar derçûye. Di serî de derhênerên wê xwestine ku ji 15 rojan carekê rojname biweşînin, lê ji ber mercên demê, bi ser neketine.

Rojname bi tîpên erebî û bi zaravayê Kurmancî hatiye weşandin û carinan jî cih daye gotarên bi zimanê Osmanî. Kurdistanê, li ser xeteke neteweyî weşan kiriye û ji bo Osmanî pergaleke meşrutiyetî xwestiye. Dema ku ji Qahîreyê bar kiriye çûye Ewrûpayê di nêrîn û ramanên xwe de hîn bêhtir radîkal bûye. Di rojnameyê de tê gotin ku ji her nusxayê du hezar heb belaş şandine Kurdistanê.

Mîqdat Mîthed Bedirxan armanc û mebesta weşandina rojnameyê wiha daxuyandiye: "Di nav tevahiya welatan de gel bi zimanê xwe dixwine û dinivîse, ji ber vê yekê jî ew gel bi pêş dikevin û digihîjin heqê xwe. Em kurd hewqasî jêhatî ne, lê mixebin ku mecal û îmkanê xwendinê tune ne û xelk cahil û nexwendî dimîne û ji bûyerên derdora xwe û cîhanê serwext nabe. Bi îzna Xwedê ji niha û pê de, ji her 15 rojan carekê ezê rojnameyê binivîsînim û min navê wê kiriye rojnameya Kurdistan. Di vê rojnameyê de ezê qala qenciya zanyarî û têgihiştinê bikim. Li ku derê mirov fêr dibe û li ku derê xwendegeh û dibistanên qenc hene, ezê nîşanî kurdan bikim. Li ku derê çi şer dibe û dewletê mezin çi dikin, çawa şer dikin û ticaret çawa dibe, ezê qala hemûyan bikim. Heta niha kesekî rojnameyeke wiha nenivisiye, ev rojnameya min ya pêşîn e, lewma dê gelek kêmanî hebin. Ez hêvî dikim hûnê kêmaniyên rojnameyê ji min re binivisînin."

Nizanim ji vê daxuyaniyê zelal re îzehet lazim dike an na. Her tişt zelal beyan kirine ku xwestine çi bikin baş tê sehkirin. Heke îro, kurd ji ber çi sedeman nikanin bi ser bikevin, ew dem jî wisa bûye. Dil dixwaze zehf tiştên giring bike, lê derfet (îmkan) û karîn, rê nadin xwestina dil. Tenê dewlet, dike ku mirov kanibe ya dilê xwe xwe pêk bîne. Her tişt bi xwedî dewletbûnê ve girêdahî ye

Di vê nivîsa xwe de, ez dixwazim ku di 1998'an de sedsaliya rojnamevanîtiya kurdan bê pîrozkirin û rojnameya "Kurdistan"ê bi aweyekî zanistî bê vekolandin. Hêvîdar im ku ev pêşniyaza me bê pejirîn.

**ZANA FARQÎNÎ**

# Papa ji bo kurdan dua kir

Pêşewayê katolîkan yê rûhanî Papayê 2. Jean Paul bi munasebeta cejna pîroz paskalya di 16'ê mehê de li Vatîkanê axaftinek kir.

Papa di axaftina xwe ya di dêra St. Pîetro de ku li hemberî 70 hezar kesî kir de wiha got: "Ez bangî malbatên ku ji ber şer belavbûyî, bangî malbatên ku bûne qurbanê kîn û nefretê dikim. Derê ma, di cejna Paskalyayê de banga xwe ya aştiyê tekrar dike. Ez dixwazim bi herkesi bidim zanîn ku em gulên eynî Xwedayî ne û ji eynî nijadî ne."

Papa ji bo neteweya kurd û Filîstîniyan dua kir. Dua ya ku Papa bi munasebeta Paskalya ji bo van neteweyan kir ev bû: "Ez serkeftinê, ji wan neteweyan dikim ku daxwazên wan yên herî kûr bi cih bên," Papa, di axaftina xwe de ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdan dialog tawsiye kir.




Papa II Jean Paul



www.arsivakurdi.org

## ...IN RE LÊPIRSÎNEK PÊK ANÎ. DI ENCAMA LÊPIRSÎNÊ DE DÎTINA HEVPAR:

# ...FIREHTIR BIKE'



ya li ser gel taqîb dikim. Bi ya min ne rast e ku mirov ji aliyê kurdan ve an jî, ji nava kurdan li vê saziyê binihêrê. Ez bawer dikim ku, hewce ye li vê diyardeyê (fenomenê) ji derve ve bê nihartin û li encamên wê yên pratîk bên şopandin.

Parlementoya kurd gelşeke dinê derxiste holê. Di gel nasnava (huwiyeta) kurd ev peyv kete jiyana siyasî ya cîhanê. Ev sazî wê bibe navenda balkişandinê. Wê welat, kes, rewşenbîr nikaribin li derveyî bandora ku ev navenda balkişandinê biafirîne, bimînin. Êdî di nava gelşa kurdî de têgîna (terîma) parlementoyê jî wê cih bistîne. Wê hem gelş mezin bibe û hem jî aliyên wê zêde bibin.

**ROJNAMEYA JIYANA NÛ**

**"Îradeya hemû bizavên kurdan negirtiye nava xwe"**

Ev roj merheleya ku em gihiştinê, ji bo neteweya kurd meclîs pir pêwist e. Bes hal û mercên ew "Meclîsa Neteweyî" ya ku di 12'ê avrêlê de li welatê Holandayê, bajarê Lahey saz bûye kêmasî û çewtiyên girîng tê de hene. Çawan?

1– Îradeya hemû bizavên kurdan negirtiye nava xwe. Eger ew parlemento desthilat û temsîla gelê xwe negire an jî li gorî wê xebatê neke, îmkan tune ye ku ew meşrûyeta gelê xwe jî bistîne.

2– Ew parlemento bi tenê di bin mahiyeta partiyekê de ye û dûrî welatê xwe, wekî delegasyoneke derveyî, xebata diplomasiyê dike.

3– Bingeha meclîseke mezin, bereyeke fireh e. Tê zanîn ku ew bere jî çiqas li serê xebat hat kirin jî, dawî bi ser neket. Pêwist e ku berî Meclîsa Neteweyî bere saz bibe.

4– Ger sedema sazbûn û faşilbûna "Meclîsa Neteweyî ya 1993'yan û xetereyên wê eşkere nebin, wê her tim bêbaweriya gel bardewam bike, li ser meclîsên neteweyî. Li gorî meclîsa îro; meclîsa 92'yan li welêt saz bûbû û endamen wê di nav gel de bûn, di wê hêle de jî pozisyona Meclîsa Neteweyî ya îro negatîf e.

**AHMET ZEKÎ OKÇUOĞLU (Xwediyê Weşanxaneya Dozê)**

**"Ev sazî bi mirîtî newelidiye"**

Agahiyên min, ên der barê Parlementoyê û hikûmetê de bi nûçeyên rojname û televizyonan ve bi sînor e. Ji ber vê yekê îmkanên min nîn in ku ez karibim nirxandineke fireh bikim.

Ji bo ku ev gavavêtin ber bi sazîbûne ve herin û bijîn, pêwistî bi du destekan heye. Yek jê gelê kurd e û ya din jî destek û piştgiriya hêzên navneteweyî ye. Yek ji van bi serê xwe têrî nake, divê bi hev re hebin.

Tê fêmkirin û xuya dibe ku di van gavavêtinan de, di navbera hêzên kurd ên neteweyî de lihevkirinek (mutabaqatek) nîn e. Dîsa der barê vê yekê de dixuye ku gelşên cidî yên navneteweyî hene. Di gel van yekan nikare bê gotin ku ev sazî bi mirîtî welidiye. Di rojên pêş de dikare ku ji van tengasiyan bêne filitîn lê mirov nikare niha bibêje wê bi ser bikeve an bi ser nekeve.

Nûbihar

**SABAH KARA (Berpirsiyarê Giştî yê Kovara Nûbiharê)**

**"Meclîs pir girîng e lê belê..."**

Vebûna meclîsê gaveke girîng û tarîxî ye. Lê belê divê neyê jibîrkirin ku meclîs careke vedibe û eger di xebata xwe de bi ser nekeve ev dê hem şewqa me bişkîne û hem jî me li ber xelkê û alemê biçûk bixîne.

Peyvek heye, pir girîng e. Nivîskarekî meşhûr dibêje: "Dema ku tiving derkete holê divê bipeqe (biteqe). Lexwe ev meclîsa ku hatiye damezirandin divê ku bi ser bikeve lê belê hemû tiştên ku dibin bi şertinan ve girêdahî ne. Yanî ji bona ku tiştek bibe, divê ku şertên wî tiştî pêk werin.

Tiştê ku em dibînin, di meclîsê de hemû hêzên kurdî temsîl nebûne. Ev kêmaniyeke mezin e. Û ev kêmanî dê di pêşerojî de serê me pir biêşîne.

Lê car din jî divê em bisebirin û bibînin ka çi dibe, çi diqede.

sterka rizgarî

**KOVARA STÊRKA RIZGARÎ**

**"Muhtevaya wê teng e"**

Divê Parlementoya Kurdistanê ya ku li Holandayê hatiye avakirin, wekî encameke qonaxa xwedî sazîbûna neteweyî bê nirxandin. Destekkrina hemû saziyên neteweyî yên demokratik ên meşrû ku li hemberî saziyên mêtingehkaran tên damezirandin jî, wezîfeyek e. Di rastiyê de dikare bê gotin ku teşebûseke wiha zehf dereng maye jî.

Çiqas hewlên xwe sazîkirinê û fikra parlementoyê bi isabet be, metoda ku di avakirina wê de bê pêkanîn û wê çawa sazî bê dagirtin jî ewqas muhîm e. Ji ber vê yekê, ji berê ve ye em vê rastiyê diparêzin, ji parlementoya Kurdistanekê ya altarnativ re belê; ji hêla din ve em balê dikişînin ser xeletiyên avakirina wê û tengbûna muhtevaya wê.

MEDYA GÜNEŞİ

**MAHMUT METİN (Berpirsiyarê Giştî yê Medya Güneşi)**

**"Parlementoya Surgunê bersiva tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê nade"**

Di 12'ê avrêlê de, li Holandayê li bajarê Laheyê bi navê "Parlementoya Surgunê" dezgehek hat îlankirin. Di parlementoyê de alîgirên hêzekê û parlementerên DEP'ê beşdar bûn.

Wekî tê zanîn parlemento dezgeheke qanûndanînê ye û temsîla neteweyekê dike. Lê ev parlementoya ku hatiye danîn vê pîvanê bi cih nayine. Di programa taslaxê de geh dibêjin: "Armanca parlementoya me di qada navneteweyî û di dîplomasiyê de temsîla tevgerâ rizgarîxwaza Kurdistanê dike" geh dibêjin: "Dê bi pirsên siyasî, kulturî, aborî û perwerdeyî yên kurdên li derveyî welêt re mijûl bibe." Ev fonksiyonên ku avakarên Parlementoya Kurdistanê li Surgunê didin xuyakirin, ji fonksiyonên parlementoyekê zêdetir, yên konfederasyoneke rêxistinên demokratik ên kurdan li derveyî welêt tên.

Îro pêwistî bi Parlementoya Neteweyî ya Kurdistana Bakur heye ku ew ji di bin avabûn û insiyatîva cepheyeke neteweyî ya Kurdistana Bakur de divê bê avakirin. Gelekî ku nehatibe mustawa ku cepheyeke neteweyî ava bike ji bo parlementoyekê neteweyî pêk bîne, hîn jê re gelek dem heye.

**ŞEHMUS ÇAĞRO (Alîkarê Sekreterê Giştî yê HADEP'ê)**

**"Saziyeke meşrû ye"**

Ew parlemento gelê kurd temsîl dike. Kurd jî wekî hemû gelên dinyayê dixwazin xwediyên mafên xwe bin. Lewma ji bo pêkanîna van daxwaziyan tiştekî wiha saz kirin.

Parlementoya li Derveyî Welêt, tiştekî ji derveyî partiya me ye. Em li Tirkiyeyê di çarçoveya "Mîsak–i Millî" de ji bo hemû gelan mucadeleyê dikin.

Ev Parlementoya li Derve, ji bo gelê kurd saziyeke meşrû ye.

**ŞERAFETTİN ELÇİ (Serkêşê Platforma Demokratîk a Kurdan)**

**"Eleqeya min pê tune ye"**

Ez dixebitim ku partiyeke legal damezirînim, eleqeya min bi wê parlementoyê tune ye.

**ZANA FARQÎNÎ**




Di Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt de ji rêxistinên etnîkî heta bi yên olî û mezhebî, ji yên siyasî heta bi yên hunerî gelek derdor hene.

www.arsivakurd.org



Banga Abdullah Öcalan ji hikûmeta alman re:

## 'Pirsgirêka me bûye navneteweyî'

Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan bangek ji hikûmeta Alman re şand û tê de got ku: Tewra wan a li hemberî kirinên artêşa tirk û ambargoya sîlehan gavên baş in. Wî got; "Gava hikûmeta Alman qedexeya li ser PKK'ê û ERNK'ê jî rake, em dikarin meseleyan bi riyê hevdîtinê çareser bikin." Öcalan, der barê têkiliyên hikûmeta alman û PKK'ê de ji vê dibêje: "Pirsrgirêka Kurdistanê, ji her caran bêhtir bûye navneteweyî. Çareserkirina siyasî bûye halekî mecbûrî. Almanya jî di nav de, divêt dewletên din jî vê yekê bibînin."

Serokê PKK'ê Öcalan di mesaja xwe de li ser kirinên dewleta tirk disekine û balê dikşîne ser bûyerên ku li Almanya diqewimin. Öcalan dibêje: "Me tu carî nexwest li Ewrûpayê bûyer çêbibin. Alîkariya ku Almanya dide siyaseta şerê taybet a tirk di nav kurdên Ewrûpayê de dibe sebebê reaksiyonan. Öcalan gotina xwe wiha didomîne; " bi awayekî vekirî em dibêjin ku ev bûyer ne bi kêfa me ye ji bo ku bûyerên wiha çênebin, em bawer dikin ku hin gav dikarin bên avêtin. Ji bo vê yekê em siyayeta hikûmeta Alaman ya sekinandina çekan û nerazîbûna çareserkirinên leşkerî wekî gavên baş dinirxînin. Piştî vê saetê divêt Almanya, ji bo çareserkirina siyasî giraniya xwe di meseleyê de nîşan bide. Gavavêtinên wiha di nava gelê me de wê bibe sebeba alîkariya vê siyasetê.

Gavavêtinên wiha yên ku em ji hikûmeta alman dipên li gorî hewcedariyên mafên mirovan û demokrasiyê ne jî. Em li benda tewra we ne ku hûn gelê kurd yê ku di nav Rojhilata Navîn de xwediyê dîroka herî kevin e wekî gelên dinyayê ji her alî ve xwedî maf bibînin. Em ji bo partiya xwe tiştekî taybet naxwazin. Mafê neteweyekî divê çi be, em wê jî, ji takdîra gelê alman re dihêlin."

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan di dawiya banga xwe de ji hikûmeta alman hêvî û daxwaz kir ku ew rê li ber PKK'ê û ERNK'ê negire, incax piştî vê niyetê hevdîtinên siyasî dikarin dest pê bikin.

**Li ser îşxala başûrê Kurdistanê, serleşkerê artêşa tirk İ. Hakkı Karadayı îtiraf kir:**

# 'Başûr wekî Vîetnamê ye'

Li gorî Buroya çapemeniyê ya Qerargeha Giştî ya ARGK'ê di nava 30 rojî de 1047 leşker di şer de mirine. Di eynî heyamê de 45 gerîla jî mirine. Der barê îşxala başûrê Kurdistanê de, serokê serleşkeriya arteşa tirk Orgenaral İsmail Hakkı Karıdayı, îtiraf kir ku cihê ketinê wekî gerdava ye Wietnamê ye û ewê li wir nemînin.

Rayedarên leşkerî piştî binketina wan ya li Başûr, li hundirê welat bi giranî jî li Dêrsimê operasyonan dikin û dixwazin nîşan bidin ku ew li hemberî gerîlayan biser dikevin. Lê li gorî agahiyêen gerîlayan, li Dêrsimê şerekî mezin û cidî çênrebûye.



**13.4.1995**

Li Botanê, li warê Hosrê gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemînê. Der heqê mirî û birîndaran de tu xeber bi dest neketin, lê şer heta demeke dirêj dewam kir.

Gerîlayên ARGK'ê li Mele Geriya Botanê hêzên dewletê xistin kemînê, di vê kemînê de 2 leşker mirin, 2 leşker jî birîndar bûn.

Li warê Basyayê, li ser girê Mam Reşa gerîlayan êrîş birin ser hêzên dewletê, di vê êrîşê de 2 subay û 14 leşker mirin.

Dîsa li Liceyê di navbera gerîla û cerdevanan de şer derket, di vî şerî de 3 cerdevan û gerîlayek mirin.

**14.4.19 95**

Hêzên ARGK'ê li Zaxoyê, li Geliyê Basyayê êrîşek birin ser hêzên tirk. Di vê êrîşê de 25 leşker û 2 gerîla mirin, bi qasî 25 leşker jî birîndar bûn. Li gorî agahiyên gerîlayan wan di vê êrîşê de çekeke MG-3, du G-3, bombeyek, 10 jarjorên keleşê û 100 berikên wan, çenteyek, dûrebînek, qutiyeke BKC'ê, palaskayek, 3 qasatora, 2 roketên keleşan, 2 roketên hawanan bi dest xistin.

Gerîlayan li devera Mafatê jî êrîşek pêk anîn û di vê livbaziyê de jî 2 çekên lawê, 700 berikên G-3'yan, 2 qutiyên MG-3'yan, 3 roketên G-3'yan, 4 roketên havanê, bombeyeke mijê bi dest xistin.

Di kemîneke gerîlayan a ku li Metînan, li warê Husorê pêk hat de jî 5 leşker mirin.

**15.4.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li herêma Behdînanê leşker xistin kemînekê. Di kemîna gerîlayan de 3 leşker mirin, 2 leşker jî birîndar bûn. Hêzên dewletê piştî kemînê bi ser gundê Sewiyê ve girtin. Hin mal şewitandin û gundî bi valakirinê gund tehdît kirin.

Li Pasûrê, gerîlayan avêtinser gundê cerdevanên Çiyakê. Di vê bûyerê de 2 cerdevan mirin, 2 cerdevan jî birîndar bûn. Piştî cerda gerîlayan, panzereke leşkerî bi roketê hate îmhakirin.

Gerîlayan li Hezexê Kerboran êrîşî gundê cerdevanên Şili û Herberê kirin. Di cerda gerîlayan de sercerdevanek û 5 cerdevan mirin. Gerîlayan dest danîn ser 45 pezên cerdevanan.

Roja 12'ê avrêlê li devera Zaxoyê hêzên artêşa tirk du gir girtin. Gerîlayan bi êrîşeke dijwar gir ji destê leşkeran derxistin. Di şerê Mam Reş de nêzîkî 20 leşker û 2 gerîla mirin. Gerîlayan dest danîn ser malzemeyên cur bi cur.

Li Dihê, leşkerekî bi eslê xwe kurd, mayinek xist pêşiya qumandarê xwe. Bi teqandina mayinê qumandan û 3 leşker birîndar bûn. Piştî bûyerê der heqê eqûbeta leşker de tu agahî bi dest neketin.

**16.4.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li ser riya Dihê dest danîn ser erzak û çekên dewletê. Li gorî agahiyên gerîlayan, wan gelek erzakê leşkeran bi dest xistiye.

Li Nisêbînê dikana Hecî Maho ku di nava gel de wekî kontra tê nasîn, ji aliyê tîmên ERNK'ê yên bajêr ve hate şewitandin. Li gundê Nisêbînê Mehera melayekî pêl mayîna leşkeran kir. Bi teqîna mayînê mela mir.

Li warê geliyê Pusawayê ku dikeve herêma Haftanînê, di navbera gerîla û hêzên dewletê de şer derket. Di vî şerî de 21 leşker mirin û nêzîkî 30 leşkerî jî birîndar bûn. Hêzên ARGK'ê didin zanîn ku wan di vê êrîşê de MG-3'yek, 2 roketên portatîf, 1700 berikên MG-3'yan û gelek tiştên din bi dest xistine.

**17.4.1995**

Li Çiyayê Gabarê li warê Mirşarê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di vî şerî de leşkerek û 2 gerîla mirin.

Di navbera çiyayên Aynê û Şina de 2 leşkeran pêl mayina gerîla kirin û lingên wan jê bûn.

Gerîlayên ARGK'ê dest danîn ser 500 pezên axayê Güçlükonakê.

Li Tûxê jî gerîlayan avête ser gundê Gülkonakê, di vê livbaziyê de 6 cerdevan û gerîlayek mirin.

**18.4.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li Dêrsimê, li warê Zingokê êrîş birin ser hêzên dewletê. Di vê êrîşa ku 4 saetan dom kir de 6 leşker mirin 2 leşker jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê li ser riya di navbera Çewlikê û Gexiyê de ketin kemîna gerîlayan. Di vê kemînê de 10 leşker mirin, ji 20'an zêdetir leşker birîndar bûn.

Hêzên dewletê li Zaxoyê bi helîkopteran dixwaze leşkerên xwe bi paş ve vekişîne. Lê li gorî agahiyên gerîlayan, di vê vekişînê de, wan bi roketan helîkoptereke tijî leşker xistine.

Gerîlayên ARGK'ê li Geverê êrîş birin ser tabûra Vargenima, di şerê ku piştî êrîşê qewimî de 19 leşker û 3 gerîla mirin.

**Navenda Nûçeyan**

## Gerîlayan êrîşî Alaya Xozatê kirin

Bi hezaran leşker li navçe û navenda Dersmê operasyonên xwe didomînin. Li dijî van operasyonên hêzên dewletê, gerîlayên ARGK'ê bi kemîn, cerd û êrîşan bersivê didin.

Roja 15'ê avrêlê saet nêzîkî, 23.00'yan gerîlayan jî du milan ve êrîşî Alaya Xozatê ya Cendirmeyan kirin. Gerîlayên ARGK'ê nêzîkî 2 saetan cerda xwe domandin û piştre vekişiyan. Piştî vekişîna gerîlayan hêzên dewletê gundê Gözeler û Tavuk bi topan gulebaran kirin. Di gulebaranê de jî gundiyan mirî û birîndar çênebûn. Eynî rojê gerîlayên ARGK'ê êrîşî gundê cerdevanên Keleyê ku girêdayî Şemzînanê ye, kirin. Di cerda gerîlayan da 2 cerdevan mirin.

**Welatê Me/Dersim**

www.arsivakurd.org



# PEYVÊN BAPÎRAN

* Siwarê xelkê her peya ye
* Nanekê zêde bidin nanpêjan,
bila nanê we spehî be.
* Diz û malxê bibin yek,
gayî ji kulekê re direvînin.
* Her tavîk yê nîsanê,
hinge milkê Xorasanê.
* Kengê ecelê bizinê bê,
diçe nanê şivanî dixwe.
* Mirov maran jî,
li ser avê nakuje.
* Bira bira ye,
bazar cuda ye.
* Medika zêrîn cihê xwe be,
Namîsa mêran serê xwe be
* Zivistan sar e, gildik yar e,
havîn germ e, gildik şerm e.
* Qedrê seyî biqasî xweyî.
* Xema aşvanî aş e.
* Xwîn nabe av.
* Dev dixwe çav fihêt dike.
* Zikê têr hay ji yê birçî nîn e.
* Zik têrê çav birçî
* Bavê rezek da kurî,
kurî gûşiyek tirî neda bavê.
* Aqilê kurî se tê de birî,
ne difiroşe ne kes dikire.
* Heçî neke xeberê mezinan
wê bi wan ve be sturihê bizinan.
* Navê giran, şehrê wêran.
* Biharê zû hilkeve,
pahîzê zû dakeve.
* Feyda gavanan siwarbûn a keran e.
* Hesp nekirîye, afirî çêdike.
* Xalan xwarzî rakirin,
maman birazî winda kirin.
* Bira ne xêrxwazê bira be
wê her dem bindestê neyaran be
* Ne kerê min e,
ne gayê te ye.
* Cehş hat, ker çû.
* Hespê çê êmê xwe zêde dike.
* Ê biçe masiyan
wê qûna wî şil bibe.
* Got: "Kitikê gûyê te derman e,
rît û ax da ser.
* Min ev çêlek şerjê kiriye,
sep vê mêlakê..
* Savara rijî, ji kêmduhnî ye
* Ji ava netrûk bitirse.
* Genim bêzîwan nabe
* Çêlekek rîxuyî,
garanekî diherimîne.
* Deriyê xwe bigire,
cîranan nexe diz.
* Nanê filehan bixwe,
mala cuhiyan razê,
xîzka êzîdiyan derbas nebe.
* Dîwaro ji te re dibêjim,
bûka min tu bibihîse.
* Av, dera kêm re diteqe.
* Dewsa kerê, feilê kerê,
bêhna kebabê ve çûm,
ser daxdana keran ve bûm.
* Kerê nebe cem mehînan
da nelime zîtik û pehînan.
* Kurmê darê ne ji darê be,
fenahiya darê nîn e.
* Bila têr be,
heskê ji tuvilê dar be.
* Nependî, keran kuta efendî.
* Mala pîrê, xweştir e ji ya mîrê.
* Berxê nêr, ji bo kêr.
* Ferxikê maran her mar e
Ferxikê şêran her şêr e.
* Dinya neyarê kewê ye,
kew jî neyarê xwe ye.
* Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.
* Hirç û govend, rûvî û sûk.
* Se direyî, karwan dibore.
* Kê tir kiriye, sêwiy bêdê û bav.
* Mala kurkan nanê tûrkan, agirê qirşikan.
* Sê tişt hene dilêş,
mitirb û mirîşk û mêş..
* Xwedê feilê marî dizane.
ji ber wê dest û lingê wî xistine zikê wî de.
Nav heft gundan gindorek,
nav heft kuran kurpalek,
nav heft pêxasan şekalek.
* Ê neçûyê govendê,
xweşreqas e.
* Qedrê gulê çi dizane,
kelbeş dixwe kerê reş.
* Ez dibêjim: "Nêr e,"
tu dibêjî min: "Bidoşe."
* Ne gurê kur be, şemamoka sur be.

**DR. HÜSEYÎN NANTU**

"Ji bo bîreweriya roja rojnamegeriya kurdî, ji bo wan zarokan, ewên ku rojnameyên Özgür Gündem, Özgür Ülke û Welat li ser destan, li Diyarbekirê û li bajarên din belav dikirin û bi destên leşkerên tariyê şehîd ketin. Ez vê helbestê diyarî wan dikim."

# PEYAM

Ewên li ser destên we
Mîna rûpelên Quranê
Li ba min pîroz in
Ewê li ser destên we
Ji bo:
Ramalîna tev jeng û qirêjan
Ji nêv welatî, ba û bahoz in
Ewa li ser destên we
Dîroka kelên bilind e
Şihîna hespê "Şêxê Pîran" e
Kilîta deriyên zindanan e
Bawername û hêviya
Kesên birûmet û xwedandoz e
Ewa li ser destên we
Gaziya qelema "Bedirxaniyan" e
Girnijîna zarokên "Helebce" ye
Peyvên diya dilovan û dilsoz e
Ewa li ser destên we
Peyama "Welat" e û
Hûn pêxemberên çerxa
kurdatiyê ne
Her peyveka li ser wan rûpelan
Hubrê wê ji xwîna sor a
"gerîlan" e
Ji verêja ferhenga "Xanî" ye
Benda dawiyê ye
Ji sitrîna "Ebdalê Zeynikê"
Ewa li ser destên we
Mewkibê "Musa Anterî" ye
Li Seyrantepe dête gihêran
Weleêêêê....
Ey zarokên rojên giran
Ey zarokên doza giran
Hûn şehîd in û
Çepkên gul û çîçekan in
Li ser mewkîbên şehîdan
Hûn serkêşên karwanê azadiyê ne
Helgirên alayê rizgariyê ne
Li pêşiya meşa serxwebûnê
Hûn pêşewan in bo tev siwar û
Egîdan
Bo tev siwar û Egîdan.

**NECÎB BALAYÎ**

# DEFTER

## Pêşeroja nêzîk

Ji ber ku dijmin şerê taybetî bi hemû çare û şêweyan pêk tîne û armanca wî qirkirina gelê kurd e, ji lew re pêwist e bersiva kurdan jî di tenga şerê taybet de be. Da ku ev şerê qirêjî ne tenê negihêje armancên xwe lê her wiha bibe werisê darvekirinê, di distûyê êrîşvanan de. Ji bo vê yekê xurtkirin û bipêşvebirina hêzên çekdar dimîne wekî merca yekemîn. Tenê bi riya hêza çekdar bingeha rizgarkirina welêt tê amadekirin. Ji aliyekî din ve pêwist e saziyên kurdî bi şêweyeke durist û bi zûtirîn kat bêne avakirin û şûna saziyên dagirkeran bigirin. Avakirina her saziyeke neteweyî belgeyek e di riya serxwebûnê de û bîr û baweriya mirov bi xwe û bi rastiya doza xwe xurttir dike. Ev saziyên wisa wê bibin bingeha dewleta kurdî, lewre pêwist e li hemû war û beşên aborî, civakî, siyasî, çandî û hwd. bêne çêkirin; ji navendên çandî û xwedegehên zarokan xebat dest pê bike û heya aboriya neteweyî û saziyên siyasî û îdarî wekî perlamanto û hikûmeta neteweyî.

Di hebûna saziyên neteweyî de wekî me got bingeha dewletê tê danîn û yekîtiya neteweyî jî tê îsbatkirin û parastin. Ewê diyar bikin ku gelê kurd serxwebûnê ne tenê wekî hêviyekê dibîne. Ewê bibin belgeyên rasteqîne ku gelê me kare dewleta xwe ya neteweyî îdare bike. Bi pêkanînên wisa, tevgera me ya neteweyî wê karibe ji çarçoveya xebata me ya kevneşopî (klasîkî) derkeve û kar û erkên nûjen bide pêşiya xwe û berpirsiyariya neteweya kurd bi giştî bîne cih.

Her saziyeke kurd di warê xwe de wê têkeve pêwendiyan bi saziyên welatên din re. Di encamên van pêwendiyan de û ji ber dademendiya doza kurdî qedr û qîmeta tevgera neteweyî wê bilindtir biben. Li ser bingeheke wisa ev tevger wê karibe çalakiyên dîplomasiyê jî firehtir bike û baştir bi pêş ve bibe.

Di sala 1995'an de ji neteweya kurd bi tevayî û ji her mirovekî welatparêz tê xwestin ku hîn germtir û hîn zanatir xebata neteweyî bi pêş ve bibe. Serokatiya neteweyî di van salên dawî de gavên dîrokî di werê dîplomasiyê de jî avêtin. Ev dewleta xwînxwar û nijadperest pêwist e bêrawestîn bête teşhîrkirin. Ji bo vê yekê û ji bo aştiyê, gerek e çalakiyên dîplomasiyê hîn berfirehtir bibin û herdem plan û pêşniyazên aştîxwaziyê pêşkeşî bîr û raya cîhanê bêtin kirin. Ev gavên aştixwaziyê ji aliyê serokatî û tevgera neteweyî ve dibin belgeyên eşkere û rasterast di destê gelê me û dostên gelê me de û riya karê dîplomasiyê hêsantir dikin. Pêwîst e her û her bête diyar kirin ku kurd ne tenê bi qehremanî karin şer bikin, lê her wiha karin bibin mamosteyên aştiyê jî. Ev rastî pêwist e roj bi roj ji cîhanê re bête dubarekirin.

**DR. GUNDÎ DILBERZ**

## DI DÎROKA TÊKOŞÎNA NETEWEYA KURD DE

# SEMBOLA EŞQ Û AZADIYÊ: HÊMIN MUKRIYANÎ



**Herdu helbestvan Hêmin û Hejar ji zaroktiyê heta mirinê ji hev neqetiyan. Li aliyê çepê Hêmin û li aliyê rastê jî Hejar tên xuyan.**

*Zorî nemawe bête ber nemamî*
*hewl û xebat im.*
*Le dagîrker pak bêtewe xakî*
*pîrozî welat im.*

*(Hewqas nemaye bête ber şitla*
*hewl û xebata min.*
*Ji dagîrker paqij bibe axa pîroz a*
*welatê min...)*

*Le meydanî şeranxêwî xebatî*
*qernî bîstem da,*
*Ser im surma ke espî sûke swarî*
*kurdî bo westan!*

*Welamî damewe pîrêkî azadey*
*cîhandî de;*
*Xetay swaran nebû pêş*
*swarekanman qurs û nawestan*

*(Di meydan şerhovîtî xebata*
*qirna bîstan de;*
*Ez şaş bûm ku hespê siwarên*
*sivik ên kurd çima westan!*

*Bersiva min da kalekî azad ê*
*cîhandîde;*
*Xetayê siwaran nîn bû, pêş*
*siwarên me qurs û na westan).*

Ev helbestên li jor, tiştên herî karîger di têkoşîn û tevgera azadîxwaziyê me kurdan de dide xuyakirin. Xwediyê "Tarîk Rûn", "Nalley Cûdayî" li ser xala bingehîn a şikestî û bi serneketina me radiweste, ew bi xwe dizane çima em nagihêjin cihê mebest û armancê, lewre wê sersûrman (şaşmayin) a xwe dide xûyakirin ku çima hespê siwarên sivik westan. Hêmin, pêwist dibîne ku pirsiyareke wisa ji aliyê "dîrok û ezmûnê" ve bêt bersivandin, "kekê azad ê cîhandîde" jê re dibêje: Xeta û kêmasî ne ji aliyê siwarên azadiye ve ye. Girift pêşsiwarên me (serkêşên me) ne. Bi rastî jî ew bi cesaretê ve, hoya derdên me dide diyarkirin, belê serkêş û pêşsiwarên me şayanî wî nebûn ku tu car pêşengiya siwarên gelê xwe bikin, lê mirov dikare bibêje, bi darê zorê xwe kirin pêşeng û piştre jî bûn hoya şikestî û nehatiya me.

Hêmin (1921–17.04.1986), helbestvanê eşq û azadiyê ye, li nik wî eşq hemû tiştên diwan û bedew li xwe digire (cîlwey cwanî le her çî da hebê xoşim dewê-cîlweya bedewiye di çi de hebe ez hez jê dikim). Li ba wî tiştên wan û bedew di vê jînê de pir in, yek ji wan jî azadî û serfiraziya mirov e, lê carinan wisa çêdibe ku rê li ber mirov tê girtin ku şîna xwe jî ji bo mirovahî azadî û wekheviyê jî rûkare bi lêv bike.

*Şîwenî min, şîwenî însanî ye*
*Bangî azadî û giroy yeksanî ye*

**Hêmin ji xeynî helbestvaniyê, nivîskar, werger û sembolê têkoşîna neteweyî bû; helbestvanê Komara Mehabadê bû. Ew li rojhilat û başûrê welêt bi çavê torevan û azadixwazekî mezin tê temaşakirin. Nivîs û berhemên wî jî, bi rastî ji bo kesên ku dixwazin zimanê kurdî yekgirtî û standart bibe hêvina (aveynê) wî karî ye. Wî berdewan digot: "Ez bi zimanê cotkar, pale û gundiyên Kurdistanê helbestan dinivîsim, berî her kesî ez helbesetên xwe ji wan re dibêjim, ew rexngirên mezin in ji bo helbestên min. Helbest jî, min ji bo hesta derûnî ya xwe gotine, tu carî mafa min tune ye ku gel minetbar bihêlim. Ez pêçewaneyê hunermendên gelê kurd im, ji neteweya xwe pir razî me.**

*Şîwenî min, şînî kurdî bêbeş e*
*Ew geley haşa deken lêy û heşe*

*(Şûna min, şîwena însaniyê ye*
*Banga azadî û gireva yeksaniyê ye*

*Şûna min, şîna kurdên bêpar e*
*Ew gelê ku haşa jê dikin û heye jî)*

Belam ew di gel wan tiştan tev û di gel ketinên dijwar jî rawestanê nizane, "diçe û diçe ber bi tiropka rizgarbûnê ve diçe."

A. Qasimloy gorbihuşt dibêje: "Felsepeya jiyana Hêmin ne wisa ye ku rûne û ji dûr ve li jiyan û xebata gel binêre, ji bo xwe an jî, ji bo gel helbestan bibêje, ew heya lutkeya azadbûne alikariya gelê xwe dike û pê re dimeşe. Hêminê têkoşer ji Hêminê helbestvan nayê cûdakirin."

Hêmin ji xeynî helbestvaniyê, nivîskar, werger û sembola têkoşîna neteweyî bû; helbestvanê Komara Mehabadê bû. Ew li rojhilat û başûrê welêt bi çavê torevan û azadixwazekî mezin tê temaşakirin. Nivîs û berhemên wî jî, bi rastî ji bo kesên ku dixwazin zimanê kurdî yekgirtî û standart bibe hêvina (aveynê) wî karî ye. Wî berdewan digot:" Ez bi zimanê cotkar, pale û gundiyên Kurdistanê helbestan dinivîsim, berî her kesî ez helbesetên xwe ji wan re dibêjim, ew rexngirên mezin in ji bo helbestên min. Helbest jî, min ji bo hesta derûnî ya xwe gotine, tu carî mafa min tune ye ku gel minetbar bihêlim. Ez pêçewaneyê hunermendên gelê kurd im, ji neteweya xwe pir razî me.

Hin tiştê jî hebûn, ku ji bo wî xewnên mezin bûn û dixwest berî mirinê bi cih bên, lê carinan hesta wî ya şeşemîn jê re digot: "Tu dê wan xweziyan bibî binê axê."

*"Xidir nêm bo temen şêt bim,*
*be kanî jînê de nusêm*
*Ewendem jîn dewê ta dem*
*denême nêw demêkî tir."*

Belê ew ne Hezretê Xidir e ku dînê temen be lê hewqas dixwaze, "dem" bixe nav "demêkî" din, demêkî din li vir bi maneya zemanekî din tê, amaje ji bo Komara Mehabadê, an jî komarekê din dike. Ji bo vî karî jî, evîn, eşq û azadixwaziyê hene, lê "Ehmedê Xanî" ên îro nîn in.

*Nema Xanî heta çîrokî eşqe ême*
*darêjê,*
*Dena hêşta le Kurdistan dejîn*
*Zîn û Memêkî tir.*

Li hemberî pirsiyara "to çît–te çî" jî, bersiva wî herî kin û karîgere, wisa ye:

*Bot nusîwem, bot binusim emin*
*çîm*
*Dundî Qendîl, gorepanî Helgurd*
*nîm.*

*Berew berzayî deçim, gerçî wird*
*im*
*Xakî ber pêy têkoşerêkî kurd im.*

Di dawiya pêşgotina xwe ya "Tarîk û Rûn" de jî wilo dibêje:

"Însan im hez ji jiyanê dikim. Naxwazim derbider û sergerdan bim, tenê têkevim şikeft û zendolan, li ser kevirên req razêm, qondaxa raq û sar a tifing bikim balîf, nanê hişk û bi kerû bixwim, ez naxwazim leqefirte û çinge kireya nîvcanan bibînim, xwîn û firmêsk bi çav bibînim, hez nakim bi teqe teqa tifeng û girmeya top û hareya firokeyê rabiçenim.

Lê belê çi bikim ez kurd im, kole me. Van tiştan tev tenanet kujran û kuştin li nik min ji koletiyê xweştir e.

Hêmin ji mêj ve bû dixwest ku keç jî, wekî tewawkerekê civata kurdî têkeve rêza şoreş û xebatê, niha em bi weşandina helbesta wî ya "Gulî Hîwa – Kulîlka Hêvî" mezgînî didin wî û jê re dibêjin. Ey xemxwarê gel û niştiman bêxem be, niha

**Gulî hîwa**
*Exter kiçî kurdî çaw mest!*
*Îlham bexşî şîirî pir hest!*
*Ey pêşmergey mîletperist,*
*Ke dîtimî tifeng be dest,*

*Zanîm gulî hîwa pişkut*
*Bayanî azadî engut...*

*Exter pêşmergey kolneder!*
*Exter ey gulî nêw senger!*
*Xwênit detkê li dimî xencar*
*Degrî berî hêrişî esker*

*Şeqit helda le zêr û cil*
*Tûrit dawe kildan û kil*
*tundit kirdwe piştênî şil*
*fîşekdanit kirdote mil*

*Pisandit bazne û pawane*
*Destit da tifing piywane...*

*Narrêjî çaw, sûr nakey lêw*
*Şane nakey biskî peşêw*
*Yekcarî firêt da çarşêw*
*Ewe rût kirde çir û kêw*

*Debrrî cergî dujminî zol*
*Be sere nêze nek be mijol.*

**Çavkanî:**
1–Dîwana "Tarîk û Rûn– Tarî û Ronî" Hêmin/ 1974.
2– Dîwana "Nalley Cûdayî– Nalîna Cudabûnê" Hêmim/ 1979.


**Ferhengok:**
**Ho:** Sebeb
**Girift:** Gelemşe
**Pirsiyar:** Pirs
**Ezmûn:** Ceribandin
**Şayan:** Laîq
**Yeksan:** Wekhev
**Bêbeş:** Bêpar
**Haşakirin:** Înkarkirin
**Belam:** Lê, feqet
**Tirofk, dund:** Lutke, zîrve
**Cwan:** Bedew
**Hest:** Îhsas
**Maf:** Heq
**Hestê Şeşemîn:** Hisa şeşemîn
**Xidir:** HZ. Xidir
**Şêt:** Din
**Dem:** Dev
**Demêkî tir:** Zemanekê din
**Pêçewane:** Berevajî, ters
**Temen:** Emr
**Amaje:** Îşaret
**Darêjê:** Çêbike
**Dena:** Naxwe
**Hêşta:** Hêjî
**Bot nusîwim:** Te ji min re nivîsandiye
**Bot binusim:** Ez ji te re binivîsim
**Emin:** Min, "Di şîveya Mukiryanî de"
**Qendil:** Çiyayekî Kurdistanê ye
**Helgurd:** Çiyayekî Kurdistanê ye
**Wird:** Hûr
**Berew berzayî:** Ber bi bilindahiyê ve
**Xak:** Ax, erd
**Sergerdan:** Belengaz
**Zendolan:** Valahiyê nav zinaran, şaxor
**Kerû:** Kûfikî bûna nên
**Awî swêr:** Ava ku tama xwê jê were
**La qefirte:** Herikîna lingên mirov berî mirinê
**Çengekre:** Herikîna destên mirov berî mirinê
**Tewawbûn:** Temambûn, qedandin
**Kiç:** Keç, qîz, dot
**Pişkut:** Pişkivî
**Engût:** Hilhat
**Koleder:** Şoreşgerên ku tim li ber xwe didin û ji xebatê aciz nabin
**Senger:** Kozik, Mewzî
**Kêw:** Çiya
**Cerg:** Kezeb

SÎRWAN REHÎM

www.arsivakurdi.org



## Nûdema biharê derket




Kovara demsalî Nûdemê hejmara xwe ya 13'an derxist. Di destpêkê de Berpirsiyarê Giştî Firat Cewerî li ser berpirsiyariya nivîskaran rawestiye û nivîsên ku di hejmara 13'ê de derketine bi çend hevokan dinirxîne.

Di Nûdema demsala biharê de pêşiya hemû nivîsan helbesta Mervanê Keleş a ku li ser Selîm Bereket nivîsandiye, balê dikişîne ser xwe. Ji xeynî vê helbestê di nava rûpelên din de gelek çîrok gotarên wêjeyî, felsefî û danasînî cih girtine. Wekî din di Nûdemê de hevpeyvîneke ku Firat Cewerî bi şairê tirk ê bi nav û deng Can Yücel re kiriye bi taybetî hêjayî xwedinê ye. Kovara Nûdemê li Ewrûpa tê weşandin û xwerû bi kurdî ye.

## Nûbihara reşemiyê


Kovara mehane ya xwerû bi kurdî Nubihar di meha sibatê de hinek bi direngî derket. derketina birêkûpêk ji bo weşaneke periyodîk pir girîng e, ji ber vê yekê pewist e ku berpirsiyarên Nûbiharê pir hay ji rêkûpêkiya di wext de derketina kovarê hebin.

Di vê hejmarê de manşeta Nûbiharê îflasa siyaseta dînê resmî, miletê resmî, mezhebê resmî ye. Di hejmara meha borî de xwedî û berpisiyarê kovarê Sabah Kara li sertêkizkirina alfabeya kurdî gotarek nivisandibû û bang li eleqedaran kiribû ku dîtinên xwe der barê alfabeyê de ji Nûbiharê re bişînin da ku bêne weşandin. Di hejmara dawî de Mehmet Uzun û Zeynelabidin Zinar li ser alfabeyê nivîsandine.




# AZADÎ

## Dêlegur



ABDURRAHMAN DURRE

Dêlegura virek Zeyneba Zer (Tansu Çiller) di xeberdaneke xwe de ji gerilayên PKK'ê re wiha dibêje: "Evlatlarım gelin teslim olun!" Yanê zarokên min werin teslîm bibin ku em we jî bi hovîtî bikujin...

Beriya her tiştî ez dixwazim ji Zeyneb Xanimê re vê rastiyê bibêjim: "Ew ne zarokên te ne, tu dêlegur î. Ew çêleyên şêran in, çêjikên şêran nabin zarokên dêleguran. Ev yek ya dudan jî ev e tu jinîtî û dayîktiya xwe her tim wekî çekeke siyasî, wekî mertal dixebitînî, ev jî heqareteke pir mezin e ku tu jinîtî û dayîtiyê dikî, belkî, di erf û adetên we de, tiştên wilo tên daqurtandin, lê di yên kurdan de nayên qebûlkirin. Jin û dayik li ba kurdan pir giranbuha ne, namûs û şeref in. Behsa wan, bi vir û derew û sextekarî nayê kirin, bi van nirx û buhayên pîroz nayê listin, nayê xapandin, nayê qirêjkirin. Lewre ew namûsa pîroz ku bi sextekarî û durûtî û viran, hate qirêjkirin ebediyen paqij nabe, lekedar dimîne. Ji nirx û buhayên xwe winda dikin, dibin wekî polîsekî bêqîmet û bêrûmet. Bi rastî jî te jinîtî pir ji qimet û rûmet xistiye. Geh tu dibêjî:"Bill Clinton dildarê min e." Geh jî tu dibêjî:" Filan kesê din..." yanê birastî wekî Zeyneba Zer, geh ev axa geh jî ewê din. Gotin durist be wekî Katerinayê her dem geh tu serî li vî çadir û konî dixî geh jî li yê din. Ya sisêyan ji, ev e ku êdî bi wan cazûtî û durûtiyên xwe, tu kesî nikarî bixapînî, dev jî wan hilebazî û teqlebaziyên xwe berde, wekî jina serfiraz û aza xwe ji wan leke û qirêjiyên pîs bişo û paqij bike.


Demokrasiyeke birastî bîne meydanê. Bi yek cumleyê, îlan bike û bibêje: " Mafên siyasî û çandî û civakî û hemû mafên ku ji gelê tirk re hatine naskirin e, ji gelê kurd re jî hene û em wan nas dikin. Hemû gel wekhev in, bira ne." Meseleyê ji bingeh ve, bi pişkê ve û hel bike. ku wê demê tu bibî dayîka birastî, ji hemû qirêjayiyan jî paqij bibî. Lê belê birastî ez ne bawer im ku tu wê yekê bikî û ev pîrozî bibe nesîbe û para te. Lewra ev ji mentiq û ramana însanî û demokratî peyda dibe, sezawarê mirovanê ez bawer nakim ku ew mentiq û namûs û şerefa dîrokî bibe nesibê we lê ez wekî insanekî demokrat û rewşenbîr dixwazim ku birastî ji te re bêjim: "Evladım!"


–Keça min beriya her tiştî, tu bibe mirov, mezin be bigihîje, ji zarokiyê xelas be, paşê ji mirovan re, bibêje: "Evladım !" gerçî tu bi salan bûyî jin û dayîk lê bi hiş û mentiq, hê jî tu zarok î. Belê zarokekî sersem û bêhiş î, şûn û şorek î, dev bixwîn û direk î, Zeyneba virek î.


We selam.


www.arsivakurdi.org

# Em ji heywanan hez bikin









Zarokino, werin em bi hev re heywanên ku li dinyayê dijîn nas bikin. Ez bawer dikim ku hûn pir hindik wan nas dikin û ji wan hez dikin. Li kuçeyan, li bexçeyan, di malên me de heywan hene. Eger li wan baş mêze bikin, dibînin ku ew tim alîkariya me dikin. Hinek ji wan şîr, hinek ji wan hêk, hinek ji wan hiriya xwe didine me. Ev ne ewqas e jî. Em hindik dibêjin.

Ên ku li gundan dijîn ew qîmeta heywanan pir dizanin. Ka bifikirin, heke ga, ker, hesp û qantir tunebûna wê zemanên berê gundî çawa cot bikirana, barên giran wê çawan bikişandana? Heke kûçik tunebûya, gur wê tim êrîşî ser pêz nekirana, ne ji pisîkan bûya wê mişk zerar nedana eşyayê di malan de?

Îro şerê gemarî li welatê me ji bilî mirovan ziyan daye heywanan jî. Leşkerê Roma Reş gava li hemberî şervanan dikevin tengasiyê agir berî dar û daristanan didin. Ji binî ve, tevî heywan dişewitînin. Carinan hûn di TV û rojnameyan de dibînin û dixwînin ku çawan leşker, hesp û qantiran, ker û dewaran didin ber guleyan û dikujin.

Li dinyayê bi dehan komeleyên heywanparêz û heywanhez hene. Lê ji van komeleyan deng dernakeve, li hemberî kirinên dewletê serî bilind nakin. Zarokino, welatê heywanan nîn e. Em ji wan hez bikin, wan biparêzin.

Zarokino! Min li ser heywanan helbestek nivîsand. Min jê re melodiyek jî çêkir. Werin em vê helbestê bi hev re bixwînin. Hûn jî dikarin jê re melodiyekê li gorî dilê xwe çêkin.

**HELBEST**

Li dinê heywan pir pir in
Her yek ji wan bi awayekî dijîn
Kar û şixulê mirovan dikin
Gerek e em ji heywanan hez bikin
Ên diçêrin, ên diçêrin
Ên aşperî dikin, ên xwe kaş dikin
Hinek ji wan wek mirovan
Şîrê xwe didin dergûşa xwe
Hinek ji wan pir pir hûr in
Bi çavan naxuyin, pir biçûk in.

Ên digirîn, perên wan hene
Nav hêkê de tên dinê
Bi nikul xwarinê dixwin
Legleg û quling, çivîk û werdek
Kew û bilbil, teyr û kijik
Hîn zehftir, pirtir hene
Navên wan nikarim bibêjim
Hêlîna xwe çêdikin li ser daran
An li quncikên dîwaran
Hinek ji wan ji azadiyê pir hez dikin
Hêlîna xwe çêdikin li ser çiyan

Ên giya dixwin, bi çar ling in
Bi poçik in, hinek ji wan bi qiloç
Penêr, toraq, mast û dew
Hemû ji şîrê wan çêdibin
Manga û çêlek, bizin û mih
Hesp û ker, xezal û kergû
Deve û fîl ew jî diçêrin
Heywanên çêre pirî jê kedî ne
Hêlîna wan tewle û gom in
Kovî ne, hinek ji wan li çolê ne
Bi şev radizên li çiya û baniyan
Ên goşt dixwin jî, bi çar ling in
Pirî har in hin kovî ne
Warê wan çiya û daristan in
Hinek ji wan wek heval in ji me re
Kûçik û pisîk, şêr û piling
Hirç û gur, rovî û tejî
Şêr, mîrê daristanan in
Di bezê de kes nagihîje piling
Di nêçîrê de tejî rêber e
Zarok pir hez dikin ji kûçikan
Di her malê de pisîkek heye.

**ROTÎNDA YETKÎNER**

## N A M E Y Ê N   X W E N D E V A N A N

### Çand û dîrok

Birêz xebatkarên rojnameya Welatê Me, beriya her tiştî ji we re silavên xwe yên germ pêşkêş dikim.

Ez ji bajarê Sêrtê vê nameyê ji we re dişînim. Hinek daxwazên min ji we hene. Hûn di rojnameyê de cihê çand, dîrok û zimanê kurdî firehtir bikin wê ji bo me xwendevanan gelek baştir bi be. Bajarê Sêrtê beriya 3 salan 58 hezar bû. Lê ji ber şewitandin û valakirina gundan îro ji 200 hezarî boriye. Gel % 80 belengaz e û feqîr e. Yê zengin jî bi giranî ereb in. Ji ber vê yekê Welatê Me li Sêrtê gelek nayê firotin. Lê rewşa me çi be bila bibe, divê em li hêjayiyên xwe xwedî derkevin.

Ji nivîskarên Welatê Me re gelek silav...

**A.Kerim Yıldız/ Sêrt**

### Berpirsiyariya me

Nameya min, ji bo xwendevanên rojnameya Welatê Me ye. Daxwazên min ji xwendevanan hem pêşniyaz in û hem jî hêvî ne.

Bi dîtin û ramana min, ji xwendevanên zimanê kurdî re, yek riyek heye; ew jî bêguman, xebatkariya li ser zeximkirina zimanê me ye. Ev kar, ji me re berpirsiyariyeke dîrokî ye. Gerek e her xwendevanek di şûna xwe de wekî ronakbîrekî/ê berpirsiyar bixebite. Bi taybetî, hembêza xwe ji hemû wêjeya gel re vebike. Vê wêjeyê bi qasî ku ji hêza wan tê û were biparêze. Ger rojek tenê jî li derengiyê bikeve, mirov wê bikeve bin kêmasiyeke gelek giran. Em xwendevan hemû dizanin ku, xwendevanên rojnameya me hin pir hindik in. Berpirsiyariya me di vî karî de gelek mezin e.

Bi hêviya ku her xwendevanek ji herêma xwe– Amed, Serhed, Botan, Xerzan û hwd.– li wezîfeyên ber destê xwe xwedî derkeve û berpirsiyariya xwe bîne cih.

**Bekirhan Yıldız**
**Amed**

### Ji xwendekaran re!

Di Sovyeta berê de hejmareke mezin xwendevanên kurd hene. Bi piraniya xwe jî xwendina bijîşkî, dermansazî, endaziyarî û hwd. dikin. Erê hemû kurd in! Lê çi buhayê didin neteweya xwe? Bi çi çavî li vê meseleyê dinêrin û wê bi çi re didin ber hev? Mixabin vê meseleyê bi ser guhê xwe re diavêjin.

Dagirkerên Kurdistanê vê nemafdariyê layiqê gelê kurd dibînin û di ser de jî xwendevanên me, bêdeng û bêeleqe dimînin. Bi rihekî sar li têkoşîna rizgariya neteweya xwe mêze dikin. Jiyaneke anarşî û bê ser û ber derbas dikin. Li min giran tê ku ez rewşa xwendekaran wiha bînim ziman, mixabin realîta piraniya wan ev e. Lê ez bêhêvî namînim û bawer im di van rojên giran ku gelê me berxwedana xwe berdewam dike de, hemû mirovên kurd cihê xwe di têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê de wê bigirin.

**Hekim Luqman**
**Xarkov**

### Ferqa peyvên erebî ji yên tirkî çi ye?

Ez xwendevanekî rojnameya Welatê Me li Norweç –Olsoyê me Di 1992'an delhîn cara yêkem ku min ev rojnameya pîroz dît, ez gelek pê kêfxweş bûm û heta niha min bidilekî gerim dom kir. Çunkî we gelek dilkîn (ehemiyet) dida zimanê kurdî û peyvên tirkî, erebî, farisî derdixistin û peyvên kurdî ên zelal di nava Welat de diweşandin. Lê niha bi zelalî nayê weşandin, min çi rexne nîn e li ser tirkî û farisî çunkî peyvên van herdu dagirkeran gelek kêm di nava hevokên kurdî de têne weşandin. Welat gelek dilkîn dida bi ziman, û bitaybetî dixebitî ku peyvên tirkî ji nava hevokên kurdî derxe. Pir jî derxistin. Lê ferqa erebî ji tirkî çi ye? Ew jî ne zimanê biyan ê dagirkeran e? Welatê Me peyvên erebî gelek bi kar tîne. Wekî mînak hejmara 12 rûpel 8–9 bixwînîn û bibînin ku çend peyvên erebî hatine bi kar anîn. Bi kemasî hatine hejmartin, nêzîkî 60 dane peyvên erebî di nav rûpela 8–9 da hatine weşandin. Sedemê wê ew e, gava ku hûn hevpeyvînê li gel mirovekî dikin, her wiha axaftinên wî/wê ku erebî di nava hevokên wî/wê daye hebin hûn zelal nakin. Divê hûn hevpeyvînan jî li gorî xwe rast bikin û ji peyvên erebî paqij bikin. Dema wisa nebe zimanê rojnameyê bi pêş nakeve, her wiha zimanê xwendevanan jî wê li paş bimîne. Peyvên erebî jî wekî yên tirkî ji nava nivîsan derxinin û ziman zelal bikin. Çavên me li weşana Welatê Me ye.

**Baran Saleh**



www.arsivakurdi.org



# JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

## Rojnameya Kurdistan

24'ê avrêlê salvegera 97'an a rojnamegeriya kurdî ye. Beriya 97 salan rojnameya Kurdistan ji hêla rewşenbîrê kurd Mithat Mîqdat Bedirxan ve hate derxistin. Di şertên pir dijwar de Kurdistan 5 hejmar li Qahîreya Misirê, 26 hejmar li hin welatên Ewrûpayê hate weşandin. Hingê jî pêkuti û zilma osmaniyan rê nedida ku kurd bi serbestî bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Ji xwe ji ber wan sebeban di 14'ê avrêlê 1902'an de rojnameya Kurdistanê weşana xwe sekinandiye. 26 hejmarên dawî di bin berpirsiyariya Abdurrahman Berdirxan de derketine. Kurdistan bi tîpên erebî lê xwerû bi kurdî bû.

Vê rojnameya yekemîn a bi kurdî tesîreke pir mezin li rewşenbîrên kurdan kiriye. Zimanê kurdî jî bi saya vê rojnameyê di mijarên cur bi cur de di nivîsandinê de hatiye bikaranîn, bi pêş ketiye. Nivîsên ku di rojnameya Kurdistanê de hatine weşandin ji bo rojname û weşanên din ên kurdî yên ku dû re derketine, bûne çavkanî û mînakên bêhempa. Lê Kurdistan ne tenê di warê zimên û rojnamêgeriyê de, di warê siyasî û çandî de ji bûye navgîna raman û xebatên giranbuha. Di warê siyasî de bûye pireke aştî û biratiyê di navbera kurd û ermeniyan de. Wê demê jî Osmaniyan pêkutî û zaroke dijwar li gelê ermenî dikirin û gelek caran osmaniyan dixwestin ku bi destê kurdan wê zilm û zora xwe li ser ermeniyan pêk bînin. Hin nivîsên ku hinga di rûpelên Kurdistanê de dihatin weşandin bala kurdan dikişandin ser listikên Osmaniyan û rê nîşanî kurdan didan da ku bi listîkên dewleta Osmaniyan nexapin û nebin navgîna zilm û zora li ser ermeniyan. Wekî din di gelek mijarên din ên siyasî de Kurdistan xwedî roleke girîng bûye.

Di salên ku Kurdistan hatiye weşandin de hestên neteweyî jî di nav kurdan de xurt bûne.

24'ê avrêlê di dîroka kurd û Kurdistanê de wê her tim bê bibîranîn lê biranîna vê rojê ya herî bimane û pêwist xwedîderketina li ziman çand û rojnamegeriya neteweyî ye.

# Atakurd

**Ev nivîs ji aliyê Ahmet Altan ve di Rojnameya Milliyetê de roja 17'ê avrêlê hate weşandin.Lê piştî Ahmet Altan ji karê xwe hate avêtin. Lê hê beriya avêtina wî vê nivîsê bala me kişandibû û me wergera-noibû kurdî.**


Kum saati
AHMET ALTAN
Atakürt
MUSTAFA Kemal, Selanik'te değil de Musul'da doğmuş bir Osmanlı paşası olsaydı,
12 Eylül darbesinden sonra bütün batı bölgesindekiler hapishanelere doldurulsa, inanılmaz işkencelerden

**Kûpura nivîsa Ahmet Altan ku 17'ê avrêlê, di Rojnameya Milliyetê de derketibû**

Mustafa Kemal ji dêla Selanîkê li Mûsilê paşayekî Osmanî bûya û piştî Şerê Rizgariyê ku bi alikariya tirk û kurdan bi ser ket, heke wî di dema avakirina komarê de navê wê jî daniya "Komara Kurdiye" û bi qerara meclîsê jî navê xwe bikira "Atakurd"...

Ji bo ku wê hemû hem welatiyên Komara Kurdiye "Kurd" bûna, emê jî "Kurd" bihatana hesibandin. Li meydanên Kızılay, Taksim, Kadıköy û Kordonê pankartên Xwazî bi wî kesî ku dibêje "Ez kurd im" bihatana dardakirin...

Li "Kurdiyê" bihata gotin ku tirk tunin û di eslê xwe de herkes kurd e, ew kesên ku ji xwe re dibêjin; "Em tirk in", bihata îdiakirin ku ew "Kurdên bahrê"ne....

Bihata gotin ku: "Heft hezar sal" berê kurd hebûn xwediyê Anadolê yê rastîn ew in û Hûn, Moxol û Etrusk jî pêşiyê wan bûn, di dersan de jî qala qehremaniyên paşayên kurd yên Osmanî bihata kirin...

Navên Teoman, Cengiz, Atilla û Osman bihatana qedexekirin û ji dêla wan em mecbûrî navên Berfîn, Tîrêj Newroz bibûna...

Em mecbûr bimana ku em roman, çîrok û şiîren xwe bi kurdî binivîsînin, bi tenê li staranên kurdî guhdarî bikin û rojnameyên xwe bi kurdî derxin..

Li dibistanên me ders bi kurdî bûna û dersên tirkî qedexe bûna... Dema me igo: "Em tirk in, tarîxeke me û zimanekî me heye." Ji bo vê yekê em bihatana girtin û mehkemekirin....

Li Stenbolê, Enqereyê, Îzmîrê, Bursayê û Edîrneyê polîsan hergav em taqîb bikirana, 'tîmên taybet' hergav em wek 'cudaxwaz' nîşan bidana û ji me şubhe bikirana ku emê "Komara Kurdiyeyê" perçe bikin. Ji bo vê yekê muameleya "sûcdar"an bi me bikirna, sırf ji ber ku em tirk in heqaret û neheqî li me bikirana...

Piştî darbeya 12 Îlonê kesên ku li rojava rûdinin têketana hepsan, îşkence li wan bi hata kirin, di hucreyên xwe de heta qirikê di nav heriyê de bûna, organên wan ên hundirîn bi ava tezyikî bihata perîşan kirin û çîpên wan ji aliyê kuçikê har ve bihata perçekirin...

Bigirtana ser mal û xaniyên me û bi îdiayên ku em 'teroristên tirk" dihewînin apartmanên me bihatana şewtandin, nehiştana em eşyayekî ji malê xwe re bibin em sirgûnî Diyarbekir û Hakariyê bikirana û em mecbûrî jiyana di konan de bikirana....

Û bigotana: "Va ye hûn giş hemwelatiyê Komara Kurdiyê ne û kurd in, hûn çima dibêjin ila tirkbûn, gava hûn bixwazin dikarin bibin serokwezîr" em tirk meyê qebûl bikira û ev gotinên wiha adîlane bidîtana?

An jî meyê negotan, nasnama jî di nav de em dixwazin ziman û çanda tirk bê naskirin û wek hemwelatiyên din "wekhev" biji?

Îro li vî welatî hemwelatiyên tirk û kurd hene, lê dirok li ser riya "Tirk bûnê" meşiya ye. Îro wek tirkekî/ê, çawa em tiştên li jor rêzkirî qebûl nakin, me xwestiye ku kurd qebûl bikin, li ser vê daxwaza ne adîlane, problem wek bombeyekê teqiyaye, ewilî teror çebûye û dû re jî bûye şerê hundurîn.

Gava hin însanên me dibêjin xelasiya ji vê xwînê û tevliheviyê încax bi "demokrasiyê" û qebûlkirina mafên "nasnameyê" dikare were cih û fikrên xwe bi vî rengî tînin ziman, ji aliyê rêvebirên me mihatabî pirseke wiha dibin:

–Çareserkirina demokratîk çi ye, nasnameya kurd çi ye?

Di bin hukimdariya "Komara Kurdiyê"de daxwazên me tirkan çi bûna, ew heq ji bo kurdan jî rewa ye û navê vê jî demokrasî ye.

Em ji xwe re çi dixwazin divêt ji bo wan kesên ku em dibêjin ew wekî me xwediyê her mafî ne, ev tişts jî bê daxwazkirin. Ma gelo ji bo nedana van mafan rijandina xwinê rast e, an jî heqê me heye ku em berê vî welatî bidin felaketekê?

Ew kesên ku bibêjin heqê me tune, ew "demokrasiyê" dixwazin.

**Werger:**
**SUUT KILIÇ**


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 550.000 TL | ☐ 45 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 1.000.000 TL | ☐ 80 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.800.000 TL | ☐ 150 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..............................
**NAVNÎŞAN** : ..............................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 293 53 19 – 245 29 91



**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Swed–** Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atina–** Ferhan Zêbarî
30-13634905


www.arsivakurd.org

